# ROJEV

24 Nîsan - Şemî 2009 Buha: 50 Kr Hejmar: 9


## Merheba ji vê cejnê re...



Pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê li Colemêrgê dikandaran derabeyên xwe daxistin û gel zarokên xwe neşandin dibistanan û ji ber vê jî tenê rayedarên dewletê pîrozbahî li dar xistin. Di qada pîrozbahiya 23'yê Nîsanê de ji bilî çend rayedarên dewlet û zarokên leşker û polîsan kes tunebû. Polîsan bi dijwarî êrîşî meşa zarokan jî kir û 4 jê giran 7 zarokên biçûk birîndar bûn.

2

### PKK ji xwe hêzeke siyasî ye…



Siyaseta legal encameke siyaseta bi salan di her qada jiyanê de û bi berdelên giran tê dayin e. PKK hêzeke herî siyasî ye... AZİZ OGUR

2

### Darbeya şevîn û siyaseta şîdethez...



Di kûraya şeveke tarî de, hêzên dewletê bi ser mal û avahiyên welatparêzên demokrat û DTP'iyan de girtin... YAŞAR EROGLU

10

### Heyran ez nivîskarim nivîskar...



Li gorî hinekan, ewcî, yêdincî. Dawî bûm PKK'cî! Bo çi? Bo ku di rojnemeya rojane, kurd û kurdî, Azadiya Welat de dinivîsim... ARJEN ARÎ



## Teklîfa sîxuriyê...

Di bin çavan de teklîfa sîxuriyê li xwandevanê zanîngehê hate kirin. Li Îzmîrê xwendekarê Zanîngeha Egeyê yê 17 salî S.K. ku di encama serdagirtina malê de hatibû binçavkirin, diyar kir ku polîsên ew birine Şaxa Zarokan a Gazîemîrê teklîfa 'Eger tu kevir bavêjî me jî em tiştekî bi te nekin. Hem li zanîngehê û hem jî di nava DTP'ê de kesên tu nas dikî hene. Ji me re agahiyan bîne em ê pêdiviyên te bi cih bînin, heta em dikarin hin caran bi hev re biçin maçê jî" kirine... R.3

reporters sans frontières

## Durûtiya 'Sînornenas'

Rojnamegerên Sînornenas (RSF) ji ber salvegera rojnamegeriya kurd bal kişand ser zextên li ser rojnamegeriyê ya li başûrê Kurdistanê û ew yek bi yek rêz kirin, lê rewşa bakurê Kurdistanê ji neditî ve hat. RSF'ê li ser salvegera rojnamegeriya kurd a roja 22'yê nîsanê daxuyanî da û zextên li Herêma Federal a Kurdistanê ya li ser azadiya çapemeniyê rexne kir. Lê balkêş e zextên bê sînor ku li bakurê Kurdistanê ji aliyê Dewleta Tirk ve li ser azadiya çapemeniyê tê kirin ji neditî ve hat... R.6

# 'Ger hewes e Zap bes e'

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Duran Kalkan êrîşên li hemberî Tevgera Azadiya Kurd wekî encama hevkariya DYA, Îran û Tirkiyeyê nirxandin. Kalkan da zanîn ku heke Artêşa Tirk operasyoneke bejayî ya li dijî Başûr pêk bîne, dê dîsa rastî aqûbeta Zapê bê

### 'AQÛBETA ZAPÊ JI BÎR NEKIN'

Koma Civakên Kurdistanê (KCK) ji ber êrîşên li hemberî qadên gerîla yên li başûrê Kurdistanê, rêveberiya Amerîkayê rexne kir. KCK'ê da zanîn ku gerîla li hemberî êrîşên bi her awayî xwedî amadekariyên pêwist e û got heke operasyon çêbe dê aqûbet wekî ya Zapê be.

### 'OPERASYON DI ROJEVÊ DE YE'

Kalkan anî ziman ku rêveberiya tirk dixwaze operasyoneke bejahî pêk bîne û got: "A rast, dewleta tirk dixwaze, pêşmergeyên PDK û YNK û leşkerên Amerîkayê jî, tevli operasyonê bibin. Lê em bawer nakin ku başûrî ji vê zêdetir destûr û piştgiriyê bidin operasyonê... R.4

### KCK: DIVÊ GEL ÎNSIYATÎF BIGIRE

Li aliyê din KCK'ê bi daxuyaniyeke nivîskî bang kir ku gel li hemberî êrîş û zordariyê însiyatîfê pêş bixe. KCK'ê aşkera kir ku konsepteke mezin a îmhayê tê lidarxistin û xwest ku gelê kurd li dijî van pêkanînan bêdeng nemîne û bi xwe însiyatîfê bigire destê xwe.



### Encama operasyona Zapê ji bo Tirkiyeyê gelek giran bû

*Par di meha sibatê de Artêşa Tirk hem di qada hewayî de hem jî bi bejayî (li erdê) xwestibû bi deh hezaran leşkerî bajo ser wargehên gerîla û beşeke başûrê Kurdistanê dagir bike. Lê leşkeran nikarî xwe li ber berxwedana hêzên HPG'ê bigire û piştî hefteyekê neçar ma ku hêzên xwe paşve vekişîne.*


Hilbijartina muxtariyê bû sedema qetilkirina jinekê... Rûpel - 7

Li pirtûka Generalên Biçûk ên Apê Mûsa ceza birîn... Rûpel - 9


# Çalakiya wekîlên DTP'ê deng veda

Parlamenterên DTP'ê bi armanca şermezarkirina êrîşên li ser partiya wan çalakiya rûniştinê di parlamentoyê de pêk anî. Parlamenterê ODP'ê Ufuk Uras jî piştgirî dayê

Parlamenterên DTP'ê ku bi armanca şermezarkirina operasyona li hemberî partiya xwe şermezar bikin şevê din li Meclisê çalakiya rûniştinê dan destpêkirin, çalakiya xwe bi dawî kirin. Hevserokên DTP'ê Ahmet Turk, Emîne Ayna jî di nav de 21 parlamenterên DTP'ê Parlamenterê ODP'ê yê Stenbolê Ufuk Uras jî tevli çalakiyê bû. Çalakiya rûniştinê saet di 08.00'an de bi dawî bû... RÛPEL - 4



### Turk: Ataturk bo kurdan 'xweserî' xwestibû

Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk di Lijneya Giştî ya Parlamentoyê de bi mebesta rûniştina taybet a 23'yê Nîsanê axivî. Turk gotinên Ataturkî yên ku di 16'ê çileyê 1923'yê de li Îzmîtê kiribûn bi bîr xistin û wiha got: "Mustafa Kemal Ataturk gotibû 'Li dewsa ku em kurdan cuda bihesibînin, di çarçoveya Makeqanûna me de jixwe dê xweseriyeke herêmî bê avakirin."

## PÇDK serbixwe dikeve hilbijartinan

Serokê Giştî yê PÇDK'ê Diyar Xerîb, da zanîn ku PÇDK amadekariyên xwe yên ji bo hilbijartinên Parlementoya Kurdistanê dimeşîne û wiha dom kir: "Beşeke mezin a hemwelatî hêvî dikin ku hilbijartin rê li ber pêşveçûna demokrasiyê vekin. Ew jî wekî PÇDK'ê di wê baweriyê de ku, tenê bi riya hilbijartinê, destkeftiyên gelê Kurdistanê dikarin bêne parastin û pêşve birin. Lewre jî em hilbijartinê ji bo hêviya gel, wekî derfetekê dibînin."... RÛPEL - 4

www.arsivakurdi.org

# Di bin çavan de teklîfa sîxuriyê

**Xwendekarê bi navê S.K. ku li Îzmîrê di encama operasyona li dijî YDG-M'ê de hate binçavkirin, got ku polîsan bi israr jê xwestine bibe sîxur. S.K. da zanîn ku psîkolojiya wî xira bûye**



Li Îzmîrê xwendekarê Zanîngeha Egeyê yê 17 salî S.K. ku di encama serdagirtina malê de hatibû binçavkirin, diyar kir ku polîsên ew birine Şaxa Zarokan a Gazîemîrê teklîfa 'Eger tu kevir bavêjî me jî, em tiştekî bi te nekin. Hem li zanîngehê û hem jî di nava DTP'ê de kesên tu nas dikî hene. Ji me re agahiyan bîne em ê pêdiviyên te bi cih bînin, heta em dikarin hin caran bi hev re biçin maçê jî" kirine.

Xwendekarê Zanîngeha Egeyê S.K. ê 17 salî ku li Îzmîrê di encama operasyona li dijî YDG-M'ê de tevî 29 kesan hate binçavkirin, got ku polîsan bi israr jê xwestine bibe sîxur û da zanîn psîkolojiya wî xirab bûye. S.K. di 17'ê nîsanê de li Bornovayê di encama serdagirtina mala xwe de hatibû binçavkirin û piştî 2 rojan di binçav de ma ji aliyê dozgeriyê ve hatibû berdan. S.K. ku tiştên jiyî ne vegot, anî ziman ku berî niha jî di 15'ê sibatê de dîsa ji aliyê ekîbên girêdayî Midûriyeta Polîsan a Îzmîrê ve hatiye binçavkirin, ew birine Şaxa Zarokan a Gazîemîr û li vir 2 rojan hatiye girtin. S.K. destnîşan kir ku 3 kesên sivîl ên xwe wekî polîsan dane nasîn, hin teklîf jê re kirine.

**'Ez ê gilî bikim'**

S.K. tiştên jiya ye wiha vegot: "Di 15'ê sibatê de polîsan bi ser mala me de girt û ez girtim binçav. Ji ber emrê min biçûk bû ez birim Şaxa Zarokan a Gazîemîrê. 3 polîsên kincên sivîl li wan hatin cem min û gotin 'Hem li dibistanê û hem jî di nava DTP'ê de hevalên te hene. Ji me re agahiyan bîne em dê hemû pêdiviyên te pêşwazî bikin'. Min jî diyar kir ku ez dê tiştek wiha nekim."

S.K. ku da zanîn piştî 2 mehan dîsa di 17'ê nîsanê de hatiye binçavkirin, anî ziman ku dîsa ew birine şaxa zarokan û wiha dom kir: "Dema ez di binçav de bûm vê carê 2 kesên cuda hatin cem min û gotin 'Dema tu cara din hatibû binçavkirin me tiştek ji te re gotibû. Em li hêviya bersiva te ne'. Wekî cara din dîsa min da zanîn ez teklîfa wan qebûl nakim. Vê carê zêde israr kirin û gotin, 'Êdî tu kevir bavêjî polîsan jî em dê te negirin binçav. Polîs dê bi tu awayî qarişî te nebe. Hem di nava DTP'ê de hem jî li dibistanê çi dibe ji me re bêje. Ne pêwîst e tu werî vir jî, em ê li te bigerin û agahiyan bigirin. Heta em dikarin biçin bi hev re li sahaya xalî maçê jî bikin'. Min teklîfa wan qebûl nekir, lê li ser hev israrkirina wan ez xistim nava gumanan. Ji ber vê yekê ez ji ewlekariya canê xwe bi fikar im."

S.K. destnîşan kir ku ji bo girtina alîkariya hiqûqî dê serî li ÎHD'ê ya Îzmîrê bide û der heqê polîsan de gilî bike.

REMZÎ COŞKUN
ÎZMÎR / DÎHA



## Gerîlayekî PJAK'ê şehîd ket

PJAK'ê ragihand ku hefteya borî li herêma Hewramanê piştî çalakiya li hemberî leşkerên Îranê gerîleyekî wan ji ber derketina pîma narincokê jiyana xwe feda kiriye.

Navenda Ragihandinê ya PJAK'ê der barê çalakiya li herêma Hewremanê ya li hemberî pasdarên Îranê de daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku di çalakiyê de 10 pasdar hatibûn kuştin. Her wiha di dema paşvekişandinê de gerîlayekî wan jî jiyana xwe ji dest daye. PJAK'ê daxuyand ku gerîlayê wan ê bi navê Cîgerxwîn dema paşvekişandinê de ferq kiriye ku pîmê narincokê derketiye. Ji bo ku tiştek bi hevalên wî neyê ew avêtiye ser narincokê û bi vî rengî xwe feda kiriye.

Gerîlayê bi navê Cîgerxwîn (Bariş Taş) di sala 1989'an de li navçeya Elbak a Wanê ji dayik bûye û di sala 2005'an de tevlî Tevgera Azadiyê bûye. PJAK'ê ragihand ku Cîgerxwîn li herêma Xakurkê, Qendîm û Hewremanê xebat dimeşand û fermandarê tîmê bûye. PJAK'ê ji malbata gerîlayê xwe û ji gelê kurd re sersaxî xwest. QENDÎL / ANF

## Li Girtîgeha Êlihê îşkence

Rayedarên Girtîgeha Tîpa M a Êlihê îşkence li girtiyê bi navê Resul Çakir kir.

**10 saetan îşkenceyê dom kir**

Skandalên li girtîgehên Tirkiyeyê bi dawî nabin. Her roj girtîgehek bi îşkence, lêdan û bi binpêkirinên mafan tê rojevê. Ligel vê yekê jî rayedarên Tirkiyeyê ji bo çareserkirina pirsgirêkan nakevin nava hewldanan. Herî dawî hate diyarkirin ku rayedarên Girtîgeha Tîpa M a Êlihê 10 saetan bênavber îşkence li girtiyê ji doza PKK'ê Resul Çakir kirine.

**'Bi zorê diaxivî'**

Ahmet Çakir diyar kir ku hefteya borî çûye hevdîtina birayê xwe û mijar wiha vegot: "Kurmamê min Resul Çakir ji doza PKK'ê bi cezayê muebetê hatiye cezakirin. 15 salan li Girtîgeha Sêrtê girtî ma. Hevsera wî jî li Girtîgeha Girtî ya Tîpa M a Êlihê dimîne. Ji ber vê yekê neqla xwe xwest Girtîgeha Tîpa M a Êlihê. Piştî hate qebûl kirin di rojên borî de sewqî Girtîgeha Êlihê kirin. Lê berî bibin qawîşa girtiyên siyasî 10 saetan îşekncе lê kirine. Dema em çûn hevdîtinê kurmamê min bi zorê xwe bi dîwar ve girt û hate cem me. Ji ber îşkenceya ditî bi zorê dikarî biaxive."

**Îşkence didome**

Çakir bi bîr xist ku binpêkirina mafan û îşkence li Tirkiyeyê berdewam dike û wiha domand: "Kurmamê min di girtîgehê de ye û di destê dewletê de ye. Ligel vê yekê îşkenceyê lê dikin. Hemû muameleyên xirab lê dikin. AKP îdia dike ku Tirkiye welatekî demokratîk e û îşkence lê tune ye. Ez ji wan dipirsim ka li ku ye demokrasiya we? Sifir toleransa îşkenceyê ev e? Bi salan e êşên ku bi gelê kurd nedane jiyîn nema. Hêj ev îşkence berdewam dikin. Bila hemû cîhan bibîne û bizanibe ku li Tirkiyeyê îşkence berdewam e. Mafên mirovan tune ye û demokrasî tune ye."

Çakir diyar kir ku ji ber îşkenceya li kurmamê wî hatiye kirin dê serî li ÎHD'a Êlihê bide û alîkariyê bixwaze. ÊLIH

## 23 kes hatin binçavkirin

Di encama serdagirtinên li bajaroka Halfeliyê ya Îdirê û navçeyên Buca û Menemenê yên Îzmîrê di encama serdagirtinên malan de 23 kes hatin binçavkirin.

Leşkerên Fermandariya Cendirmeyan a Halfeliyê bi ser gelek mal û kargehan de girt. Di serdagirtinan de 17 kes hatin binçavkirin.

Yekîneyên Midûriyeta Polîsan a Îzmîrê li taxa Ulukentê ya navçeya Menemenê bi ser 3 malan de girtin. Serdagirtinê 3 saetan berdewam kir. Hate zanîn ku di dema lêgerînê de mal hatiye serobinokirin. Di encama lêgerînan de Mehmet Sadik Çetîn, Abdullah Avci û Sînan Yilmaz hatin binçavkirin. Her wiha di heman demê de li Bucayê jî serdagirtinên malan pêk hatin. Di encama serdagirtina li vir de jî Emrah Pîrbudak, Ferhat Secînç û Kesîp Rahat hatin binçavkirin. 6 kesên hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Bozyakayê. ÎZMÎR / ÎDIR

## 'Zarok derveyî hiqûqê tên pirsiyarkirin'

ÎHD'a Mersînê di rapora binpêkirina mafan a amadekirî de bal kişand ser pirsiyarkirina derveyî zagonê. Di raporê de hate daxuyandin ku piraniya kesên tên binçavkirin bi awayekî nefermî tên pirsiyarkirin, dema binçavkirinê tê dirêjkirin û zarok di girtîgehan de rastî lêdanê tên.

ÎHD'a Mersînê têkildarî "Îşkence û muameleya xirab a di bin çavan de" ya li hemberî zarokan raporek amade kir. Di rapora bi sernavê, "Binpêkirinên mafan ên di dema binçavkirina zarokan de" de hate daxuyandin ku di warê şêwazê de jî gelek pêkanînên derveyî hiqûqê li hemberî zarokan pêk tên. Komîsyonê bi zarokên di girtîgehê de mayîn jî hevdîtinek kir û çavdêriyên xwe di raporê de nivîsandin. Di raporê de hate destnîşankirin ku li hemberî binpêkirinên mafên zarokan ên di dema binçavkirinê de ne li dozgeriyê ne jî li dadgehê tu muamele nayên destpêkirin. Di raporê de hate daxuyandin ku zarok bi awayek derzagonî tên binçavkirin û li hemberî zarokên bi îdiaya, "Endamtiya rêxistinê" tên girtin li girtîgehê jî rastî heman binpêkirinên mafan tên. Di raporê de ev xal hatin destnîşankirin: "Binçavkirin gelek caran bi awayek keyfî pêk tên. Di binçavkirinên li Mêrsînê hind zarok li cihê bûyerê û gelek jî bi saetan an jî roja piştî bûyeran li cihên din tên binçavkirin. Di dema binçavkirinê de kî bikeve ber destê polîsan tê binçavkirin."

Endamê Komîsyonê Mafên Mirovan a Baroya Mêrsînê Prz. Mehmet Altuntaş jî pêkanînên derketine holê wekî şerma hiqûqê nirxand. Altuntaş, diyar kir ku wî binpêkirina mafên zarokan ji komîsyonê re ragihandiye û wiha got: "Ev zarokên ku mafên wan hatine binpêkirin zarokên kurd ên ku tê îdiakirin beşdarî çalakiyan bûne. Dema ku mirov li naveroka dosyayan dinêre, mirov dibîne ku binpêkirina mafên zarokan bi awayekî kêfî pêk hatiye. Her çiqas zagon mafên zarokan biparêzin jî di pratîkê de binpêkirinek berbiçav heye. Lê ligel vê yekê dadger û dozger tu lêkolînan nadin destpêkirin. Bi vî rengî hiqûq jî holê radibe." Altuntaş, daxuyand ku Midûrê Polîsan ê Mêrsînê di salekê de nêzî 100 zarokî bi hinceta, "Beşdarî çalakiyên kolanan yên derzagonî bûne" binçav kirine û ji 3 beşên van 2 beş hatin girtin. Altuntaş, ji rayedarên Midûriyeta Polîsan, dozger û dadgeran xwest ku di warê binpêkirina mafên zarokan de bi hîstiyarî tev bigerin. MÊRSÎN

### 'Tirkiyeyê zarokên xwe ceza dike'

ÎHD'a Mêrdînê bi minasebeta Cejna Zarokan 23'yê Nîsanê daxuyaniyek nivîskî da û diyar kir ku li hemû deverên Tirkiyê merasîmên fermî tê li dar dixin, lê merasîmên tên lidarxistin şeklî ne. ÎHD'ê di daxuyaniya xwe de bal dikşand ser binpêkirinên mafên zarokan ên li Tirkiye û Kurdistanê pêk tên wiha got: "Tirkiyeyê bi îdiaya pêşketina hestên aştiyane zarokên cîhanê ji bo pirozbahiya 23'yê Nîsanê her sal tîne Tirkiyeyê, lê li zarokên xwe bi 10 salan ceza dibire. Heta niha hin jî kiryarên cinayetên zarokan ên di nava 5 salên dawî de pêk diyar nebûne. Em li welatekî zarok tên cezakirin dijîn. Bi guhertiha hin zagonan li zarokên temenên wan biçûk cezayên giran tên birîn. Li Mêrdînê di nava salekê de ji ber Zagona Tekoşîna li Hemberî Terorê (TMK) nêzî 50 zarok hatinê binçavkirin û der heqê wan de cezayên giran hatine xwestin." Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku hê jî zarokên li Girtîgeha Tîpa E ya Mêrdînê tên girtin û ji mafên xwe mehrûm in hene. Di dawiya daxuyaniyê de hate xwestin ku zagona TMK'ê ya destûrê dide cezayên giran li zarokan were birîn bê guhertin. MÊRDÎN

## Li karê mamoste binêrin!

Li navçeya Şemzînan a Colemêrgê 6 xwendekarên ji aliyê rêveberiya dibistanê ve ji dibistanê hatin avêtin, dan zanîn ji ber sedemên siyasî ji dibistanê hatine avêtin û serî li dozgeriyê dan.

Xwendekarên bi navê Erkan Ozkuyuncu, Samî Kaya, Fatîh Eroguz Samî Elmas û M. Tahîr Ozer ku li pola 3'yemîn a Lîseya Sabrî Ozel a Şemzînanê dixwînin, ji aliyê rêveberiya dibistanê ve bi hinceta li gorî dîsîplîna dibistanê tevnegeriyane ji dibistanê hatin avêtin. Xwendekaran ku dan zanîn ji ber tevlî çalakiyên demokratîk bûne ji dibistanê hatine avêtin jî, diyar kir ku ji ber mamosteyê bi navê Mekselîna Savucak a nû li dibistanê peywir girtiye ji dibistanê hatine avêtin û serî li dozgeriyê dan.

Bavê Erkan Ozkuyumcu Yunus Ozkuyuncu ku da zanîn kurê wî ji ber helwestek kêfî ji dibistanê hatiye avêtin. Ozkuyuncu, destnîşan kir ku di 4'ê Nîsanê roja Meşa Amara pêk hatiye de zarok ji dibistanê hatine avetin û wiha dom kir: "Ez roja bûyerê çûbûm Amarayê. Mekselina Savucak a wê rojê nû hatibû, heqaret li zarokan kiribû. Piştre ji derdikeve ser maseyê û şîmaqê li rûyê xwendekaran dixe. Piştre li zarokên me gilî dike û zarokên me ji ber nêzîkatiyên wê ji dibistanê hatin avêtin."

Yunus Ozkoyuncu, destnîşan kir ku xwendekar ji ber nêzîkatiya kêfî ya mamosteyê mijara gotinê, Midûrê Dibistanê Arîf Yilmaz û Cîgirê Midûrê Perwerdehiya Neteweyî ya Şemzînanê Senar Yuce ji dibistanê hatine avêtin û anî ziman dê pêy bûyerê bernedin. Ozkoyuncu, derbirî ku 6 xwendekar ji ber sedemên siyasî ji dibistanê hatine avêtin û bi lêv kir ku dê li hemberî bûyerê bêdeng nemînin. Di vê navberê de 6 xwendekaran li Dozgeriya Komarê ya Şemzînanê gilî kirin.

Midûrê Lîseya Sabrî Ozel a Şemzînanê Arîf Yilmaz têkildarî mijarê daxuyand ku ji ber memurê dewletê ye dê daxuyaniyê nede. " COLEMÊRG

www.arsivakurdi.org

# ‘Aqûbeta Zapê li benda wan e’

**Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Duran Kalkan êrîşên li hemberî gelê kurd wekî encama hevkariya DYA, Îran û Tirkiyeyê ya li dijî PKK’ê nirxand. Kalkan da zanîn ku heger artêşa tirk operasyoneke bejayî ya li hemberî Başûr pêk bîne, dê rastî aqûbeta Zapê bê**

Koma Civakên Kurdistanê (KCK) ji ber êrîşên li hemberî qadên gerîla yên li başûrê Kurdistanê, rêveberiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê sûcdar kir. KCK’ê da zanîn ku gerîla li hemberî êrîşên bi her awayî xwedî amadekariyên pêwist e û heger Artêşa Tirk operasyoneke bejayî ya li hemberî Başûr pêk bîne, dê rastî aqûbeta Zapê bê.

Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Duran Kalkan êrîşên li hemberî Tevgera Azadiya Kurd nirxandin û got ku, Amerîka li hemberî PKK’ê, bi Îran û Tirkiyeyê re hevkariyê dike. Kalkan bi bîr xist ku ji sala 2003’yan û pê ve, ji ax û sahaya hewayî ya Iraqê Amerîka berpirsyar e û got: “Hêzên tirk û Îranê êrîşî qadên gerîla yên li başûrê Kurdistanê dikin. Heke Amerîka destûr nede Tirkiye û Îran nikarin van êrîşan pêk bînin”.

**‘DYA fiîlî cih digire’**

Kalkan bal kişand ser rewşa balafirên casûsî yên bêpîlot ên Amerîka yên li herêmê jî û got: “Balafirên Amerîkayê xebatên keşfê û îstixbaratê dimeşînin û bi vê yekê jî awayekî fiîlî di operasyonên artêşa tirk de cih digirin”.

Duran Kalkan da zanîn ku rêveberiya Başûr jî, bi bêdeng mayinê, piştgirî dide êrîşên hêzên tirk û îranî û got: ‘Heke ev dengê xwe derxin, reaksiyon nîşan bidin û serî li saziyên navneteweyî bidane, dê dewleta tirk û Îranê nekaribûna wekî îro êrîşan bikin’.

**‘Operasyona bejayî di rojevê de ye’**

Kalkan anî ziman ku rêveberiya tirk dixwaze operasyoneke bejahî pêk bîne û got: “A rast, dewleta tirk dixwaze, pêşmergeyên PDK û YNK û leşkerên Amerîkayê jî, tevlî operasyonê bibin. Ango tevî destûr dayina operasyoneke bejayî, ew bixwe, pêşmerge û leşkerên Amerîkayê jî, ji aliyê başûr tevlî operasyoneke bejahî ya li hemberî PKK’ê bibin”.

Kalkan destnîşan kir ku dewleta tirk di civîna sêalî ya Baxdayê de jî ev daxwaza xwe aniye ziman û hê jî hewl dide vê daxwaza xwe bide qebûlkirin û got: “Navenda Hevkariya li dijî PKK ya li Hewlerê jî, ji bo vê armancê hatiye avakirin û dîsa dewleta tirk ji bo vê armancê baregehên xwe yên li Ranya û Diyanayê nû dike û li gelek deverên Başûr bi taybet jî li herêma Behdînan û Soran tîmên tabyet û endamên MÎT’ê xistine nava tevgerê”.

**‘Derfetê didin dewleta tirk’**

Duran Kalkan diyar kir ku ew bawer nakin PDK û YNK ji yên îro zêdetir derfetan bidin dewleta tirk û got: “Jixwe li Başûr qasî 5 hezar leşker û 50 tang û yekîneneyên zirxî yên tirk hene. Zehmete PDK û YNK ji vê zêdetir destûr bide, ku bide jî dê ev bibe dagirkeriyê û dê bandora PKD û YNK’ê kêm bibe. Lewma wê destûr nedin hêzên tirk li Başûr zêde dibin’.

Kalkan anî ziman ku heger dewleta tirk operasyoneke bejahî pêk bîne, wê ev yek têkçûna rejîma tirk jî bi xwe re bîne û got: ‘Di vê rewşa krîzê de wê bi çi operasyona berfireh pêk bîne. Lê heger israr bike û operasyoneke bejayî pêk bîne, wê têkçûna rejîmê bi xwe re bîne’.

**‘Gerîla ji pêvajoyê re amade ye’**

Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê bal kişand ser amadekariyên gerîla jî û got: ‘Gerîla li hemberî rewşên bi her awayî amadekariya pêwist kiriye û heger dewleta tirk êrîşek pêk bîne, dê aqûbeta li Zapê anîbû serê hêzên tirk, ji wê xerabtir bîne serê wan’.

Duran Kalkan da zanîn ku qabîliyeta operasyonî ya Artêşa Tirk kêm bûye û hêviya serketina li hemberî gerîla winda kiriye û wiha got: “Du sedemên vê hene. Yekemîn di operasyonan de darbeyan dixwe û ya duyemîn jî, êdî nikare li hemberî windahiyan raya giştî îkna bike. Ji ber van du sedeman wekî berê tevli operasyonan nabin, ji yên berê zêdetir, operasyonên biçûk pêk tînin û girîngî didin teknîkê. Ji generalan, heta sûbayan û ji wan heta leşkerên ji rêze, îro bi sendroma PKK û kurd dijîn.”



Di sibata 2008’an de Artêşa Tirk li Zapê darbeyeke mezin ji gerîlayan xwaribû.

**Operasyonên li Bakûr**

Kalkan der barê operasyonên Artêşa Tirk de jî agahî da û got: “Dewleta tirk piştî hilbijartinan li bakurê Kurdistanê lez da operasyonan. Li Dêrsim, sêgoşeya Amed, Çewlik, Mûş, Garzan, Besta, Botan, Cûdî, Gabar, Zagros û li gelek deverên din dest bi operasyonan kirin. Li herêma sînor di nava tevgera leşkerî de ye. Rojê ji 3 heta 5 operasyonan pêk tîne. Girîngî dide operayonên noqteyê û teknîkê”.

**‘Rastiyan berovajî dikin’**

Kalkan îdiayên der barê windahiyên gerîla de jî derew derxistin û got: “Ji ber operasyonan me jî şehîd dan. Windahiyên artêşa tirk ji yên me gelek zêde ne. Me şehîdek li Zagrosê û 5 şehîd jî li Botanê dan. Di adarê de jî, me şehîdek li Mêrdînê dabû, yanî hejmara şehîdên me yên mehên zivistanê tev 7’in. Hejmara artêşa tirk dide derew in û armanca wan psîkolojîk e.”

Kalkan anî ziman ku gerîla li gorî biryara KCK’ê ya bêçalakitiya leşkerî tevdigere û got: “Hemû yekîneyên me xwedî agahî ne. Pêwistiya biryarê bi cih tînin. Lê belê Artêşa Tirk guh nade û hewl dide biryarê sabote bike. Aqûbeta biryara me ya ji niha û pê ve jî, girêdayî rewşa dewleta tirk e.” **BEHDÎNAN / ANF**

## Serbixwe dikevin hilbijartinan

Partiya Çareseriya Demokratîk a Kurdistanê (PÇDK) daxuyand ku dê bi komek kesayet û rêxistinên sivîl ên civakî re bi lîsteya serbixwe beşdarî hilbijartinê bibe.

PÇDK’ê têkildarî mijarê li Otêla Avaşîn a Hewlêrê civînek çapemeniyê li dar xist. Di civîna ku çapemeniyê eleqeyek mezin nîşan da de, Serokê Giştî yê PÇDK’ê Diyar Xerîb, 111’emîn salvegera roja rojnamegeriya kurdî pîroz kir û dest bi axaftina xwe kir. Xerîb, da zanîn ku PÇDK amadekariyên xwe yên ji bo hilbijartinên Parlemantoya Kurdistanê dimeşîne û wiha dom kir: “Beşeke mezin ên welatiyên Herêma Kurdistanê hêvî dikin ku hilbijartin rê li ber pêşveçûna demokrasiyê vekin. Ew jî wekî PÇDK’ê di wê baweriyê de ku, tenê bi riya hilbijartnê, destkeftiyên gelê Kurdistanê dikarin bêne parastin û pêşve birin. Lewre jî em hilbijartinê ji bo hêviya gel, wekî derfetekê dibînin.”

Xerîb, derbirî ku PÇDK dê bi komek kesayetî û rêxistinên sivîl re bi lîsteyek serbixwe ya bi navê ‘Lîsa Hîwa’ û bi diruşma “hîwa ji serkeftinê binirxtir e” beşdarî hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê bibe û wiha pê de çû: “Lê dîsa jî deriyê me ji bo lîsteya hevbeş vekiriye.” Diyar Xerîb, anî ziman ku ew hêvî dikin ku hem Komisyona Bilind a Hilbijartinan, hem jî Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo hilbijartin bi awayekî demokratîk derbas bibin, di nava xebatan de bin.

Xerîb, da zanîn, wekî di çapemeniyê de jî hate weşandin, Tirkiyeyê xwestiye ku PÇDK bê astengkirin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em vê yekê wisa dihesibînin ku dixwazin PÇDK’ê asteng bikin ku tevlî hilbijartinan nebe.” Xerîb, derbirî ku wan serî li Komisyona Bilind a Hilbijartinan daye û got: “Komisyonê diyar kir ku heta niha der barê astengkirinê de tiştek ji wan re nehatiye gotin. Di sala 2005’an de jî xwestin, em beşdarî hilbijartinê nebin, lê nekarîn ser bi kevin û em beşdarî hilbijartinê bûn.” **HEWLÊR**

# ‘Çalakiyên me yên demokratîk dê bidomin’



Çalakiya rûniştinê ya parlamenterên DTP'ê ku bi armanca şermezarkirina operasyona li hemberî partiya xwe li parlamentoyê dabûn destpêkirin duh saet di 08.00’ê bi dawî bû. Lê çalakiyên DTP’ê dê bidomin.

Parlamenterên DTP'ê ku bi armanca şermezarkirina operasyona li hemberî partiya xwe şermezar bikin şevtira din li parlamentoyê çalakiya rûniştinê pêk anî. Hevserokên DTP'ê Ahmet Turk, Emîne Ayna jî di nav de 21 parlamenterên DTP'ê Parlamenterê ODP'ê yê Stenbolê Ufuk Uras jî tevli çalakiyê bû. Çalakiya rûniştinê duh saet di 08.00'an de bi dawî bû. Hevseroka DTP'ê Emîne Ayna ku piştî civînê daxuyaniyek kurt da, ji bo hevalên wan ên piştgirî dane çalakiyê, xebatkarên komê yên piştgirî dane û ji endamên çapemeniyê re spas kir. Ayna, destnîşan kir ku bi armanca serbestberdana hevalên wan û şermezarkirina operasyona li hemberî DTP'ê çalakiya rûniştinê li dar xistine û wiha got: "Heta hevalên me bên berdan dê çalakiyên me yên demokratîk dom bikin."

Di çalakiya rûniştinê ku pêr êvarê saet di 23.15'an de piştî hevdîtinên têkildarî pêşnumeya qanûnê ya têkildarî 1'ê Gulanê bi dawî bûn dest pê kir de dîmenên rengîn derketin pêş. Piştî destpêkirina çalakiyê piştgiriya parlamenterên jin û henekên siyasî bal kişand. Ji bilî pêdiviyên zarurî yên wekî çay, cigarê parlamenteran dema xwe hemû li salona Meclîsê derbas kir. Hevserokê DTP'ê Ahmet Turk ku di saetên êvarê de ziyareta xwe ya li derveyî welat bi dawî kir û hate Tirkiyeyê, ligel ku westiyayî bû dîsa jî heta saet 03.00'yê şevê li parlamentoyê ma û piştgirî da hevalên xwe. Turk li ser irsara parlamentarên din ên DTP’î ji parlamentoyê derket. Parlamenterê ODP'ê yê Stenbolê Ufuk Uras jî bi DTP'iyan re heta sibehê me.

***Ji çalakiyê çend not:***

✓ Piştî çalakiya rûniştinê dest pê kir bi 15 deqeyan Serokê Parlamentoyê Koksal Toptan, bi Amîrê Îdarî yê AKP'ê Parlamenterê Semsûrê Husrev Kutlu re hate Salona Parlamentoyê û parlamenterên DTP'ê ziyaret kir. Toptan ku piştî 5 deqeyan ji cem DTP'iyan veqetiya hate hîn bûn ku Toptan ji xwest ku DTP’î dawî li çalakiya xwe bînin.

✓ Ji ber çalakiya rûniştinê li Salona parlamentoyê û kulîsan 10 polîsên sivîl hatin peywirdarkirin. Polîs jî bi çalakvanan re heta sibehê man.

✓ Li ber parlamentoyê ambulans, bijîşk û hemşîre amade bûn.

✓ Hate dîtin ku parlamenterên DTP'ê yên di dema çalakiyê de car caran derdiketin kulîsê gelekî bi moral bûn.

✓ Parlamenteran di çalakiyê de dema xwe bi zêdeyî bi sohbetê, xwendina rojname û pirtûkan derbas kirin.

✓ Emîne Ayna dema ku çalakî bi dawî bû û ji salonê veqetiya bi destê polîsên peywirdar girt û spas kir. Ayna, dema ji parlamentoyê veqetiya diyar kir ku dê sibê bi meclîsa giştî ya partiyê re nirxandinek hîn berfirehtir bikin.

✓ Kamerayên TRT'ê yên bicihkirî yên li parlamentoyê bi hinceta "ewlekariyê" heta sibehê vekirî hatin hiştin. Qeyda DTP'î heta sibehê bi kamerayan hatin şopandin hate girtin. Amîrê Îdarî yê Nobedar Husrev Kutlu, berî çalakî dest pê bike diyar kir ku dê kamera vekirî bin û ji bo vê yekê agahî da DTP'iyan. **ENQERE / DÎHA**

*Serokê Parlamentoyê Koksal Toptan xwest DTP’iyan ji bo betalkirina çalakiyê îkna bike. Lê serkeftî nebû.*



# DTP'ê 23'yê Nîsanê protesto kir

**Partiya Civaka Demokratîk li hemû bajar, navçe û bajarokên ku şaredariyên wan di dest de ne pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê protesto kirin. DTP'ê bi daxuyaniyeke nivîskî anî ziman ku ji ber pêkutiyên li ser partiya wan û girtina zarokan tevli pîrozbahiyan nebûne**

DTP'ê bi boneya 23'yê Nîsanê Cejna Zarokan û Desthilatdariya Neteweyî daxuyaniye nivîskî da û ragihand ku bi armanca şermezarkirina AKP'ê beşdarî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nabin.

Navenda Giştî ya DTP'ê bi boneya 23'yê Nîsanê Cejna Zarokan û Desthilatdariya Neteweyî daxuyaniye nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku ev cejn di atmosferek demokrasî û azadî li welat bi cih nebûne de pêk tê.

Di daxuyaniyê de hate destnîşan kirin ku 23'yê Nîsanê di rewşek xemgînî de tê pêşwazîkirin û wiha hate gotin: "Li aliyekê beşa civakê ya di avakirina komarê de kedek mezin dayî ji ber krîza aborî rojên dijwar dijî û bi xizanî û birçîbûnê re rû bi rû ye. Li aliyê din îktîdara otorîter, neteweperest û şoven a azadiyê ji hemwelatiyan re zêde dibîne heye. Îradeya gel tune tê hesibandin û giringiya Meclisê hindî diçe kêm dibe. Vesayeta leşkerî zêdetir dibe û desthilatdariya li ser gel dijwar dibe. Bi taybetî di dema Hikûmeta AKP'ê de meclis hatiye baypas kirin û polîtîayên şîdetê û neteweperestiyê ketine rojevê."

**'Pêkutî zêde dibin'**

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku bi operasyona li ser DTP'ê îradeya gel tê binpêkirin û bi awayekî bêrêz êrîş tên lidarxistin. Di daxuyaniyê de wiha tê gotin: "Em hêvî dikin ku 23'yê Nîsanê bibe wesîle ku pergal xwe di ber çavan re derbas bike û dawî li ser zordariya li hemberî civakê dimeşîne bîne. Ev cejn diyarî zarokan hatiye kirin. Ji ber vê yekê gelek girîng e. Li aliyekê ji çar aliyên cîhanê zarok ji bo vê cejnê tên vexwendin lê zarokên kurd vê cejnê di girtîgehê de derbas dikin. Ev bêdadî û zordariya li ser zarokên kurdan tê meşandin di dema AKP'ê de derketiye asta herî jor." Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku ji bo şermezarkirina van pêkanînan wekî DTP beşdarî pîrozbahiyan nabin. ENQERE / DÎHA

## Şaredarên DTP'î tevlî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nebûn

Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî di nav de şaredarên DTP'î ku li hemberî girtin û operasyona li hemberî DTP'ê nerazîbûn nîşan dan, tevlî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nebûn.

Hemû şaredarên li Amedê, Şirnex, Mêrdîn, Riha, Çewlik, Sêrt û Êlihê yên DTP'î ku li hemberî operasyon û girtinên li dijî DTP'ê nerazîbûn nîşan dan, li ser biryara ji aliyê Navenda Giştî ya DTP'ê hate girtin tevlî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nebûn. Di pîrozbahiyan de cihê di protokolê de ji bo şaredaran hatibû veqetandin vala man. Di pîrozbahiyan de ji bo welatiyan silav bikin li bajaran walî û fermandarên garnîzonan, li navçeyan jî qaymeqam û fermandarên garnîzonan amade bûn. AMED





## Zarok neçûn merasîm betal bû

*Li tevahiya Tirkiyeyê ku ji Cejna Newrozê û vir de zarok tên binçavkirin û girtin, li Colemêrgê zarokên xwe neşandin merasîma Cejna Zarokan a 23'yê Nîsanê. Ji ber vê yekê merasîma 23'yê Nîsanê ya li Stadyuma Colemêrgê pêk hatî, bêcoş derbas bû. Li bajêr ku esnafan derabeyên xwe venekirin, rêveberên DTP'ê û Wekîlê Şaredarê Colemêrgê Metîn Kazandioglu ligel hatibûn vexwendin jî bi armanca protestokirina operasyona li dijî DTP'ê, beşdar nebûn. Her wiha ji ber malbatan zarokên xwe neşandin merasîmê, xwendekar pir kêm bûn, meşa di merasîmê ya her sal tê kirin jî, nehate kirin. Helwesta zarokan ji bo dewletê bû şokeke mezin...*

## Li Colemêrgê esnafan dikan venekirin

Li Colemêrgê di saetên serê sibê de di dema pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê dest pê kirin de tevahiya esnafan dikan girtin.

Li Colemêrgê ku bi boneya şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê bi hefteyan e çalakî didomin, îro jî bi venekirina darabeyan operasyon şermezar kir. Di saetên serê sibê de dema pîrozbahiya 23'yê Nîsanê dest pê kirin, tevahiya dikanan girtî bûn. Li ser girtina dikanan jî li gelek deverên cuda yên bajar girse gihiştin hev û operasyona li dijî DTP'ê şermezar kirin. Ligel xwepêşandanan polîs û leşkeran jî tedbîr girtin. COLEMÊRG

# Ji DTP'ê protestoya 23'ê Nîsanê

DTP'yiyên şaredarên partiyê jî di nav de bi armanca şermezar kirina darizandina zarokên kurd a li Dadgehên Cezayên Giran beşdarî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nebûn û bi daxuyaniyan polîtîkaya Hikûmeta AKP'ê şermezar kirin.

***AMED:*** Şaredarên DTP'ê bi armanca şermezar kirin operasyona li ser partiya xwe li ber DTP'a Amedê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Baydemîr û 18 şaredarên navçe û bajarokan beşdarî daxuyaniyê bûn. Di daxuyaniyê de sloganên, "Zordarî me bêzar nakin", "PKK gel e, gel li vir e", "Bijî Serok Apo" hatin avêtin. Serokê DTP'a Amedê Alî Şîmşek diyar kir ku di vê 23'yê Nîsanê de jî Tirkiye ji demokrasî û azadiyan dûr derbas dike û wiha axivî: "Ji ber vê yekê ev 23'yê Nîsanê ji hemû dema zêdetir bi xemgînî derbas dibe. Li aliyekê beşa civakê ya di avakirina komarê de kedek mezin dayî ji ber krîza aborî rojên dijwar dijî û bi xizanî û birçîbûnê re rû bi rû ye. Li aliyê din îktîdara otorîter, neteweperest û şoven a azadiyê ji hemwelatiyan re zêde dibîne heye. Îradeya gel tune tê hesibandin û giringiya Meclisê hindî diçe kêm dibe. Ji bo şermezarkirina van pêkanînan em beşdarî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nabin."

***ŞIRNEX:*** Di daxuyaniya li ser DTP'a Bajar pêk hat de Serokê DTP'ê Halîl Îrmez, Şaredarê Şirnexê Ramazan Uysal, şaredarên navçe û bajarokan û ligel rêveberên DTP'ê bi sedan kes amade bûn. Di daxuyaniyê de sloganên, "Zordarî me bêzar nakin" û "Bila destên dirêjî aştiyê dibin bişkên" hatin avêtin. Şaredar Uysal diyar kir ku Tirkiye di atmosferek ji dûrî aştî û azadiyê de pêşwazî dike wiha axivî: "Em hêvî dikin ku 23'yê Nîsanê bibe wesîle ku pergal xwe di ber çavan re derbas bike û dawî li ser zordariya li hemberî civakê dimeşîne bîne. Ev cejn diyarî zarokan hatiye kirin. Ji ber vê yekê gelek girîng e."

***RIHA:*** Şaredarên navçe û bajarokan, endamên meclisên şaredariyê, rêveberên DTP'ê û bi sedan kesî li ber DTP'a Rihayê daxuyaniyek dan çapemeniyê. Komê panparta navê 51 endamên DTP'ê yên li Amedê hatine girtin li ser heyî ya reş bi avahiya partiyê ve daliqandin. Serokê DTP'a Rihayê Îbrahîm Ayhan, Şaredara Wêranşarê Leyla Guven, Şaredarê Serêkaniyê Îsmaîl Aslan, Şaredarê Pirsûsê Ethem Şahîn, Şaredarê Alîgorê Îbrahîm Parildar, Şaredarê Gokluyê Bazo Yilmaz û bi sedan kes beşdar bûn.

***ÊLIH:*** Bi beşdariya Serokê DTP'a Êlihê Ozcan Erdem, Wekîla Şaredarê Êlihê Nergîs Ekîncî, Şaredarê Bekîrhanê Selahattîn Karabulut, rêveberên DTP'ê, endamên meclisên şaredariyê, nûnerên rêxistinên civakî û bi sedan kesî li ber avahiya DTP'a Êlihê daxuyanî hate dayîn. Wekîla Şaredar Nergîs Ekîncî bal kişand ser zordariyên li ser gel tên meşandin, karaktera antî demokratîk a pergalê û xwest ku dawî li îktîdara otorîter, nijadperest û şovenîst bê.

***SÊRT:*** Li Sêrtê jî bi armanca şermezarkirina operasyona li dijî DTP'ê pankarta reş a bi sernavê, "Em girtinan şermezar dikin û li cem hevalên xwe ne" a navên 51 DTP'iyan li ser bi avahiya partiyê ve hate daliqandin. Serokê DTP'a Sêrtê Abdurrahman Taşçi, Şaredarê Sêrtê Selîm Sadak û şaredarên navçe û bajarokan ên DTP'ê, rêveberên ÎHD'ê û bi sedan kes beşdarî daxuyaniyê bû. Sadak daxuyanî xwend û operasyona li dijî DTP'yiyan şermezar kir.

***WAN:*** Li ber avahiya DTP'ê ya Wanê daxuyanî hate dayîn. Serokê DTP'a Wanê Selîm Ertaş, Şaredarê Wanê Bekîr Kaya, şaredarên navçe û bajarokan, endamên meclisa şaredarî û meclisa giştî ya bajar û rêveberên DTP'e beşdar bûn.

***ÎDIR:*** Bi beşdariya Serokê DTP'a Îdirê Ahmet Barbaros, endamên meclisa giştî ya bajar û meclisa şaredariyê beşdarî daxuyaniya li ber avahiya DTP'ê pêk hatî bûn. Serokê Rêxistina DTP'ê ya Îdirê Ahmet Barbaros diyar kir ku wesayeta leşkerî li Tirkiyeyê berdewam dike û Meclis hatiye baypas kirin. Barbaros darizandina zarokên kurdî ya li Dadgehên Cezayên Giran jî şermezar kir û xewst ku dawî li vê bêdadiyê bê.

***MÛŞ:*** Di daxuyaniya li avahiya DTP'ê ya Mûşê pêk hatî de Serokê DTP'ê Maşallah Yamaş, şaredarên Gimgim, Kop û Melazgirê, endamên meclisa giştî ya bajar û meclisên şaredariyê û gelek kes beşdar bûn. Di daxuyaniyê de sloganên, "Hêza DTP'ê ya gel e" û "Zordarî me bêzar nakin" hatin avêtin. Li ser navê koma dowîzên, "DTP gel e gel li vir e" û "Bimire DYA hevkara wê AKP" hildan. Şaredarê Yemîşena navçeya Kopê Alî Haydar Aydin daxuyanî xwend û diyar kir ku îradeya gel ji hêla AKP'ê ve tune tê hesibandin.

***QERS:*** Li ber avahiya DTP'a Qersê daxuyanî hate dayîn. Serokê DTP'ê Velî Mukyen, endamên YDG-M'ê û gelek kes bi pankarta, "Tevgera Ciwanên Demokratîk" heta Rawestgeha Dîgorê meşiya. Di meşê de sloganên, "Zordarî me bêzar nakin" hate avêtin. Serokê Rêxistina DTP'ê Velî Mukyen diyar kir ku bi dehan zarokên kurd hatine binçavkirin û girtin, ji ber wê yekê beşdarî pîrozbahiyên 23'yê Nîsanê nabin.

***ÎZMÎR:*** Komek endamên DTP, ÎHD, Însiyatîfa Dayikên Aştiyê û gelek saiyên din li ber avahiya DTP'a Bayrakliyê hatin cem hev. Girseya 5 deqeyan çalakiya rûniştinê li darxist bi sloganên, "DTP gel e, gel li vir e", "Pêkutî me bêzar nakin", "Şer na aştî niha" zordarî protesto kirin.

***MÊRSÎN:*** DTP'a Mersînê jî li ber avahiya partiyê daxuyanî da çapemeniyê. Serokê DTP'a Mersînê, serok û rêveberên navçeyan û gelek kes beşdarî daxuyaniyan bûn. Serokê DTP'a Mêrsînê Ramazan Ekîncî bal kişand ser zarokên kurdan ên li Dadgehên Cezayên Giran tên darizandin û diyar kir ku ev encama polîtîkaya îmha û înkara kurdan e. DÎHA

www.arsivakurd.org

# Li Kurdistanê durûtiya RSF'ê

## RSF di salvegera rojnamegeriya kurd de bal kişand zextên li ser rojnamegeriya Herêma Federal a Kurdistanê û binpêkirina mafan yek bi yek rêz kir, lê rewşa bakurê Kurdistanê ji neditî ve hat

Rêxistina Sînornenas a Navneteweyî (RSF) li ser salvegera rojnamegeriya kurd a di 22'yê nîsanê de daxuyaniyek da û zextên li Herêma Federal a Kurdistayê ya li ser azadiya çapemeniyê rexne kir. Lê balkêş e ku zextên bê sînor li bakurê Kurdistanê ji aliyê Dewleta Tirk ve li ser azadiya çapemeniyê tê kirin ji neditî ve hat. Her wiha li rojhilatê Kurdistanê zextên Dewleta Îranê û li başûrojavayê Kurdistanê jî yên Sûriyeyê hene.

Li Parîsê navenda RSF'ê li ser mijarê daxuyanî hat dayîn. Di daxuyaniyê de tê gotin ku piştî Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê (DYA) Iraq dagir kir û şûn ve Herêma Federal a Kurdistanê ji şer û pevçûnên xedar hat parastin. Lê li vê herêmê li ser azadiya fikr û ramanê gelek binpêkirina mafan pêk hat. RSF destnîşan dike ku li herêmê azadiya çapemeniyê di bin tehdîdê de ye û destnîşan kir ku rojnamegerên xweser li hemberî vê hevkariya xwe xurt dikin.

RSF diyar dike ku rojnameger li herêmê pirtir ji ber agahiyên nelirêtiyan û agahiyên li ser rêveberiya herêmê dibin hedef. Dema ev agahî di çapemeniyê de tê weşandin rojnamegerên berpirsên nûçeyan dibin hedef. Ji bo vê mînaka qetilkirina Soran Mama Hama (23) tê dayîn. Hama roja 21'ê tîrmeha 2008'an de di mala xwe de tê kuştin. RSF dide zanîn ku ligel bertekên wan û hêzên navneteweyî yên din li ser mijarê lêpirsîn nehat kûrkirin.



Bûyerên li dijî azadiya çapemeniyê li Herêma Federal a Kurdistanê pêk hatine yek bi yek hatine rêzkirin ji ber vê hatiye xwestin ku tedbîr bên girtin.

Ev nirxandin, rexne, şermezarî û xwestina girtina tedbîran di cih de ne û divê bê navber bêne kirin. Lê divê cihêkarî û durûtî neyê kirin. Binpêkirina mafên azadiya çapemeniyê yên hin deveran bê dîtin û yên hin herêman neyê dîtin nabe. RSF jî wisa kirî. Hêvî ev bû ku binpêkirina mafên azadiya çapemeniyê ya çar parçeyên Kurdistanê di vê roja girîng a rojnamegeriya kurd de ji hemû aliyê xwe ve bihata dîtin û di raporê de cih bigirta.

Binpêkirinên li bakurê Kurdistanê sînor nas nakin. Lê RSF li vir sînor nas dike û sînor datîne. Sînornenasiya xwe li vir radiwestîne û girtina rojnameyan, sansûrkirina malperan, binçav û cezakirina rojnamegeran nabîne. Ev çiqas li gorî ruhê Rojnamegeriya Sînornenasiya Navneteweyî ye?

Li bakurê Kurdistanê yekane rojnameya kurdî a rojane Azadiya Welat ev 4 car in ku tê girtin. Dibe ku carek ji berçav bireve û neyê dîtin. Lê 4 car… Heke ev her 4 car ji ji aliyê RSF'ê ve neyê dîtin navê wî divê bê lêkirin. Ev nav jî navê 'sînor naskirin'. Di têkoşîna azadiya çapemeniyê de 'naskirina sînoran' divê tune be. Daxwaza me rojnamegerên bakurê Kurdistanê jî ev e. Belê rojname, TV, radyo, kovar û hwd.yên weşana kurdî dikin rastî zext, girtin, cezakirina girtîgeh û pereyên bê hesab tên; daxwaz ev e ku li gorî krîter û etîka rojnamegeriya Sînornenas ev jî bêne dîtin.

HEQÎ BOLTAN AMED

# Iraq xeta neftê ya Sûriyeyê ji nû ve vedike

Serokwezîrê Iraqê Nûrî El Malîkî diyar kir ku lûleya neftê ya ji Iraqê diçe Sûriyeyê ji nû ve vedikin.

Malîkî daxuyaniya ser mijarê ligel Serokwezîrê Sûriyeyê Nacî Otrî da. Serokwezîrê her du welatan piştî hevdîtina li Bexdayê di daxuyaniya hevpar ya çapemeniyê de diyar kirin ku wan li ser vekirina xeta lûleya neftê ku ji Iraqê diçe Sûriyeyê li hev kirine. Li gorî vê xet ji nû ve tê tamîrkirin û piştî tamîrê dê bê vekirin. Xeta luyeyê ya neftê ji Iraqê tê di ser Sûriyeyê de neft diçe Derya Spî. Heke ev xet bê vekirin kontrola Amerîkayê ya li ser nefta Iraqê lawaz dibe û destê Sûriyeyê yê li Rojhilata Navîn dê xurt bibe. Her wiha bandora vê xetê dê li ser xeta lûleyê ya ji Kerkûkê dertê û di ser Kurdistan û Tirkiyeyê de dadikeve Derya Spî zêde bibe.

Nûrî El Malîkî destnîşan kir ku aliyan li ser neft, enerjî û bazirganiyê peymana stratejîk mohr kirine.

Serdana Serokwezîrê Sûriyeyê di nav 30 salên dawî de serdana herî payebilind e ku pêk hatiye.

Têkiliyên Sûriye û Iraqê di sala 1980'î de xera bû. Di heman demê de li her du welatan jî partiyên Baas ên rakîbên hev bûn desthilat û di nav wan de dijberî kûr bû. Têkiliyê nav her du welatan ji sala 2006'an û şûn ve ber bi başiyê ve diçe. **BEXDA**

# DYA'yê bi zimanekî tund Pakistan rexne kir

Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clinton Hikûmeta Pakistanê ya ku li herêma Malakandê bi Talîbanan re peymanek çêkiriye bi zimanekî tund rexne kir. Clinton da xuyakirin ku hikûmeta Pakistanê xwe teslîmî Talîban û eşîrên derdora wê kiriye.

Clinton di kongreya komisyona karên derve de ev axaftin kir û der barê vê peymanê de wiha axivî: Ev guhartina di siyaseta hikûmeta Pakistanê de pêk hatî ji bo ewlekariya cîhanê wekî talûke û tehdîdeke mezin e.

Ji aliyekî din ve Balyozgerê Pakistanê yê Washingtonê Huseyîn Hakkanî anî ziman ku ew tevli daxuyanî û metirsiyên Clintonê nabe û wiha pê de çû: "Em qebûl dikin ku têkiliya bi Talîbanan re bi serê xwe probleme; lê ew ne wekî ku Clinton dibêje, 'meseleyeke man û nemanê' ye."

Her wiha Hakkanî anî ziman ku artêşa Pakistanê di wê hêzê de ye ku bikaribe li hemberî Talîban şer bike lê ev yek bi riya gefên hêzên derve pêk naye, ev bi îradeya Pakistanê ya serbixwe dikare pêk were.

Berî demekê jî hatibû ragihandin ku Talîban li Dola Sewadê ya bakurê Pakistanê ku di bin kontrola xwe de ye berfireh kiriye.

Li gorî berpirsiyarên herêma Bunerê ku 100 km dûrî paytexta Pakistan Îslamabadê ye, mîlîtanên ku ji Malakand û Dola Sewadê derbasî herêmê bûne noqteyên kontrolê avakirina û li deverê dewriye pêk tînin.

Nerazîbûnên li dijî peymana Makaland ya ku di navbera Serokomar Asif Ali Zerdari û talîbanan de çêbûye ji der û hundir her ku diçe zêde dibin. **NEW YORK**

# Kerkûkê wek herêma kurdan nabîne

Neteweyên Yekbûyî (NY) duh rapora xwe ya li ser mijara herêmên bi nakok, Kerkûk jî di nav de ji bo berpirsiyarên Iraqê pêşkêş kir. Ev rapora ku çavê her kesî li hêviya wê bû, behsa herêmên ku dê tevli Herêma Federal a Kurdistanê bibe nehate kirin.

Rapora ji alî UNAMI ya ku li Iraqê misyona NY'ê dike hatiye amadekirin. Pêr ev rapor ji alî Nûnerê taybet ê Iraqê yê Sekreterê Giştî yê NY'ê Staffan de Mistura ligel Serok û 2 cîgirê serokê Konseyê ev rapora radestî Hikûmeta Federal a Kurdistanê hate kirin. hate zanîn ku rapor der barê herêmên bi nakok ên bakurê Iraqê (Herêma Federal a Kurdistanê) de hatiye amadekirin.

Di daxuyaniya nivîskî a NY'ê de hatiye destnîşankirin ku "UNAMI der barê parêzgeha Kerkûkê de 4 pêşniyar hatine şîrovekirin" Her çar pêşniyar jî Kerkûkê wekî yek nasnametî dibîne û tu pêşniyarên ji bo parvekirina vê herêmê di nava van her çar pêşnyaran de tune ne.



Tê gotin ku pêşniyarên NY'ê bingeha xwe ji makezagonên Iraqê digire û tê gotin ku pêwîst e di vê der barê de di nava aliyan de lihevkirin pêk were û rengê referandûmê aşkera bibe. Her wiha agahiyên der barê 4 pêşniyaran de cih digire.

Madeya 140 a makezagonên Iraqê rê dide referandûma Kerkûk a xwedî 900 hezar nifûs lê ev zagon heta niha di pratîkê de nehatiye pêk anîn.

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku ji bo ev kar baş bimeşe zêdeyî salekê xebat hatine kirin û ew wekî parçeyekî ji karê UNAMI'yê ye ku li gor biryara 1770 û 1830 ya Konseya Ewlekariyê tevgeriyaye.

Hê jî der barê 'herêmên bi nakok' ku ji 12 herêman pêk tê û Kerkûk jî di nav de ye û rastî siyaseta erebkirinê ya Sedam Huseyîn hatibûn, tu lihevkirin di vê der barê de nehatiye misogerkirin.

Ev rapora ku ji pêşniyarên NY'ê pêk tê ji alî 15 dîplomat, mamosteyên zanîngehan û dîrokzanan ve ji sala 2008'an ve hatibû dest pê kirin û amadekirin. **BEXDA - ANF**


Bîranîn



M. Selim Çevik
23.04.2005

*"Weleh keçik e bileh keçik e*
*sola wê sor e*
*pahnî bike qemçik e*
*Dikim ramûsim keçik biçûk e"*
*Mamosteyê hêja em te ji bîr nakin*

Rêveber û xebatkarê komala çand û hunerê ya Dicle û firatê


# Tirkiye û Ermenistanê li hev kir

Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê û Ermenistanê di heman demê de bi daxuyaniyan aşkera kirin ku ji bo lihevkirina Tirkiye û Ermenistanê li ser planekê li hev kirine. Di daxuyaniya Wezareta Tirkiyeyê de plana mijara gotinê wek 'nexşeriya lihevkirinê' hatiye binavkirin. Hat vegotin ku plan berfireh e û dê her du aliyan jî bextewar bike. Balkêş e daxuyaniya Wezareta Ermenistanê jî di heman naverok û çarçoveyê de hat dayîn.

Têkiliya navbera Tirkiye û Ermenistanê bi navbeynkariya Swîsreyê tê meşandin.

Di daxuyaniyên ku li herdu paytextan de jî zimanekî veşartî hatiye bikaranîn û agahiyên berfireh nehatine vegotin.

Berdevkê Karên Derve yê Amerîkayê Robert Wood da zanîn ku Washingtonê ev demeke dirêj e ku dixwest navbera Tirkiye û Ermenistanê çêke. Hat vegotin ku Amerîka dixwaze ligel her du welatan ji bo pêkanîna aştiya navbera aliyan bixebite. Di navbera Ermenistan û Tirkiyeyê de têkiliyên dîplomatîk ligel ku nîn e jî li pişt deriyên dîplomatîk bi awayê veşarî hevdîtin têne kirin. Sînorê navbera Tirkiye û Ermenistan ji ber şerê navbera Ermenistan û Azerbaycanê ya sala 1993'an ji aliyê Tirkiyeyê ve ji bo ku alîkariya Azerbaycanê bike girt.

Lê Azerbaycan ji ber vê pêvajoya ku di pêşengiya Amerîkayê de berbihev hatina Tirkiye û Ermenistanê nerazîbûnek tund nîşan dide. Helwesta Tirkiyeyê li dijî Azerbaycanê wek îxaneteke mezin bi nav dike.

Li ser vê têkiliyên xwe yên bi Tirkiye û Amerîkayê di ber çavan de derbas kir û berê dîplomasiya xwe da Rûsyayê. Ev jî dê destê Rûsyayê ya li Qafqasyayê xurtir bike. Ji ber vê Amerîka û Tirkiye ji ber ku destê wan dê li Qafqasyayê lawaz bibe ketina nav fikaran. **ENQERE**

# Li Iraqê 73 kes hatin kuştin

Li bajarê Bexda û Bakubaya Iraqê du teqînên întiharî pêk hatin û bi giştî 73 kes hatin kuştin. Balkêş e ku ev teqîn di saetên îlankirina girtina lîderê El Qaîdeyê de pêk hatin.

Di teqîna Bakubayê de pirtirên wan şiiyên Îranê 45 kes û di teqînên Bexdayê de jî 10 jê polîs 28 kes hatin kuştin û 52 kes jî birîndar bûn. Berdevkê Artêşa Iraqê got ku lîderê El Qaîdeyê yê Iraqê Omer El Bexdadî hat girtin. **BEXDA**

# Ji nû ve xwedî derketina têkoşînê

HARUN SERDAR*

**Serdestan li hemberî serkeftina gelê kurd rêz nîşan neda, sedema vê ya sereke ew e ku vegera kurdan ya şaristaniyê tenê bi pêşengiya PKK'ê dikare bibe. Ji bilî vê yekê PKK li gel şoreşa erkî, siyasî, şoreşa bingehîn di kesayetiya mirov bi xwe de, çêdike**



Di civatên asan de, bedeldayîn bi xwe re destkeftinan an jî serkeftinan tîne. Serkeftin jî, tim dibe xwedan xwediyan. Lê nakokiya mezin e ev taybetiya asan jî ji bo kurdan vajî digere. Hemû civatan pergala xwe ya civakî, çandî û jiyanî ava kiriye ev rista civatan ji bo pergala cîhanî serkeftin e, hemû civak pergala xwe ber bi kûrahiya şaristaniyê ve bi serbilindî pêşde dibin.

Guman nîn e ku her civak di nava xwe de, bi hewldanên cihêreng vê kana şaristaniyê dewlemend dike her wiha jî diherikîne. Ji bo pêşketinê her çiqas astengiyên bingehîn hebin jî, lê di astekê de dikare bê meşandin. Lê belê dema mijar dibe kurd, ev rewş serûbin dibe. Mesele ne ew e ku yekitiya kurdan nîn e an jî, tiştekî din.

Bi nêrîneke seranser, mirov dibîne di dema niha de gelê kurd, pergaleke wisa xurt daniye ku pir civakên weke dewlet têne nasîn, ji wan zêdetir bi rêxistin in û xwedî vîn in. Ev rewş di piraniya sazî û avahiyên civaka kurd de, tê xuyakirin. Her wiha ev rastî pir caran hatiye ceribandin. Îro gelê kurd xwe di hemû qadan de, dikare biparêze, ji ber ku rêveberiya wî ya stratejîk û taktîk têrê dike. Lê di nava çerxa sîstema cîhanê de nîne. Mînak: di warê sporên parastinî de, pir ji kurdan di qada navnetewî de, xwedî xelatin lê tev jî, li ser navê dewletên dij-kurd xelatan digirin. ji ber ku cîhana xwe pêşverû dibîne cîh nade qet saziyeke kurd jî.

Bi taybet ev hilbijartina 2009'an mînakek pêş çave gelê kurd êdî naxwaze di bin nîrê kedxwariyê de, bimîne. Gel ev îradeya xwe rêvebirinê li gorî zagonê wana û cîhana serdest jî, bi awayeke eşkere îlan kiriye. Ev asta gelê kurd gihiştiyê asteka heta bilind. Lê dewlet dewsa rastî bê dîtin û ew mafê heta niha dereng hatiye hiştin bi lez û bez li xwediyan were vegerandin, dîsan di pêşengiya Amerîkayê de, êrişan xwe nû kir. çima û çi tê xwestin?

Hin kesên wek kurd têne nasîn lê di eniya dijmin de, kar dikin û rewşenbîrên wan her ku êriş çê dibin bi yek axaftineke dizîrin. Bila PKK belav be! hemû sedem PKK ye. Ev ji hêlek ve rast dibêjin, ji ber çi? Yê ku kedxwarî bin guhê hev xistî û ev ramana azadîxwaz li civakê bi cîh kirî Partiya Karkerên Kurdistane. û heta niha xebata kedxwariyê ya sereke ew e ku nahêlin PKK di nava civatê de, were nîqaşkirin. Li gorî xwe nav lê kirine her qal bikin wî navî jî pêre bi kar tînin ew nav jî di çavê civatê de, bûye sembola neqencî û nebaşiyan ji ber vê jî, rastî nayê mijarê.

Ji bo mijara kurd û çareseriya wê, divê rewşa PKK'ê bi rastiya wê baş were rojevê ev ji bo çareseriyê xaleke bingehîn e. Rastî ji hêla rêveber û payedarên kedxwariyê ve tê zanîn ew dizanin ku civata wan bi vê rastiyê bibihisin nikarin pêşî li mezinbûna PKK'ê bigirin sedemê astengiyan ev e. Lê hemû dezgehên perwerde û ragihandinê di destê wan deye û ji bo ku rewş şêlû were nîşandan û pirsgirêk bê çareserî bimîne bi hemû taqeta xwe dixebitin. Heta carinan wisa bê fitûr diçin hima dibêjin ger PKK nebûya wê pirsgirêk çareser bûbûya!

Serdestan li hemberî serkeftina gelê kurd yê mezlûm rêz nîşan nedan, naxwazin civaka kurd cîhê xwe yê eslî ji nû ve di nava şaristaniyê de, bigire. Sedemên vê jî, hene. Ya sereke ew e, vegera kurdan ya şaristaniyê tenê bi pêşengiya Partiya Karkerên Kurdistan dikare bibe û hêza çerxa cîhanê digerîne vê yekê ji bo xwe xeter dibîne. PKK li gel şoreşa erkî siyasî, şoreşa bingehîn di kesayetiya mirov bi xwe de, çê dike. Ew jî, avakirina baxçê nûye her wiha rê nade mar û mûr. Ew kesayetiya ji 2550 salan vir de, belawela serberjêr diçû di rêveberiya PKK de, ji nû ve bi wateya xwe tê ava kirin.

Xwenasîna kurdan plangerên mezin ditirsîne ew rastiya heta niha veşartibûn, naxwazin perde ji ser ve hilbiçe. Niha jî dixwazin kurdan weke nasîneke ku li der ê dora xwe neyar binasînin, ev ji bin xetere. Ji ber ku yê heta niha hatî bindestkirin gelê kurde, ne zordeste. Lê çi mixabin di rewşa başûr de bala xwe baş bidinê dixwazin kurdan weke cihûyan tecrîd bikin nihave ev xebat heye. Ev xal divê ji bîr nebe. Gelê kurd xwediyê vê axêye kî dikare dest dirêjiya bike, çi heqê kê heye?

Azadiya kurdan ya sererast, derûniya hemû dewlet û civakên têkildar diguherîne. Ev guherîn di eslê xwe de, erêniye. Lê ji niha ve hewldanên heyî ji serî ve dixwazin vê berevajî bikin. Di başûr de, ev hinek bi ser xistine. Ramana PKK'ê namzete bo ku Rojhilata Navîn ji destê kedxwariya mezin derîne. Ji ber van egeran e ev dem dema ji nû ve xwedî derketina li Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Rojeva kurdan bi tenê divê ev be heta ku azadî bi dest xistin. Êdî riyên fetilandî çare nîn in, zelalî aşkera ye. Xeta têkoşînê her ber bi jor ve hildikişe yên bi ser bikevin kurd in, karker in.

**Navenda Lêkolînên Stratejîk a Kurdîstanê*

# Vizeviza mozê ji destê germê ye

KEREM SOYLU

Wiha tê xuyakirin ku partiya AKP'ê û serokê wê gelekî ketine nava tengasî û tevliheviyan. Berad û fortên ku birêz Recep Tayip Erdogan beriya hilbijartinan da xwe tev bi avê de çûn û ew li erdê ket. Lê ev ketin weke ketina wî ya ji hespê ket nebû, ev ketin gelek bi êş bû û kesekî ew ji erdê ranekir. Ji ber wê çendê dema ku rabû bi toz û xubara ser û guhê xwe ve bê muhlet dest avêt Partiya Civata Demokratîk DTP'ê. Ji ber ku heviyên xwe yên berî hilbijartinê bi dest nexist, çavên xwe girt û çoyê xwe hejand. Rêveber û endamên DTP'ê hilanîn binçavan û ew girtin. Ev yek gotineke pêşiyên me tîne bîra mirov, "Vize viza mozê ji destê kelekela germê ye" ango di dema havînê de ku erd û asîman li mozeqirtkê dikelije, ew êrîşî vî alî, wî alî dike û ji hewla canê xwe kî dikeve ber ew pê vedide. De em ê jî li birêz serokwezîr biborin, ji ber dîmenên Newrozê û rêjeya hilbijartinên herêmî li Kurdistanê ew gelekî bêhnteng û bê tehemul kir.

Lê bila baş bê fêmkirin ku mebesta gelê kurd û DTP ne bi tenê hilbijartinên herêmî ne. Belkî mebesta sereke çareseriya pirsgirêka gelê kurd e ku di binê vê pirsgirêkê de mafên mirovîn ji kurdan re hatiye qedexekirin. Ziman, çand û wêjeya wan hatiye talankirin, bi mirina nasname û kesayetiya xwe re rû bi rû maye, ku ew jî kînora bi xwîn e jê re tedawî pêwîst e.

Kurd bi meclisa DTP'ê û bi parlamenterên xwe û bi şaredarên xwe bi tevayî 200 kes in, de ka werin em kumên xwe deynin û jê pirsan bikin. Gelo ev civak nikare kurdan temsîl bike, hûn çima vê girseya neteweya gelê kurd muxatab nagirin û bi çi rûyî hûn bi kurdên ji aşitiyê re amade ne re rûnanên. Hûn bi biyaniyan re têkildar in, ma çi mafê we heye hûn piyên wan didin ser stûyê kurdan. Baş bizanibin biyanî wê rojekê ji ber berjewendiyên xwe pêhînekê li we bixin hûnê wê gavê çavên xwe vekin.

Birêz serokwezîrê Tirkiyeyê ma hûn çima pirsgirêka kurd ji nedîtî ve tên, hûn çima ew qas banga birêz Ahmet Turk bêbersiv dihêlin. Ji ber ku hûn newêrin rastiya pirsgirêkê bînin qadê, hûn newêrin derên hemberî îradeya neteweya kurd. Kurdan çi demê destê aştî û wekheviyê her wiha biratîyê dirêjî we kiriye we destê wan qut kiriye. Dîrok gelek vekirî dide nîşan ku kurd ji qedîmê zeman de binecihên axa Mezopotamyayê ne. Selçûkî kirine mêvan û ji Selçûkî û Osmanliyan re gelek fedakarî kirine di demên Komara Tirkiyeyê de bi temamî di telî û tengiyan de li cem wan bûne, xwîna bav û kalên wan li çar aliyê welêt rijiyaye û şehîd ketine. Hûn çima mafên wan ê rewa nadin wan. Nihêrîna we li pirsgirêka gelê kurd bi neyînî bê dadî ye û di tu zagonên dinyayê de ev yek ji nedîtan ve nayê xuyan. Cihê xwestekên neteweya kurd bi vekirî hem li gorî demokrasî û mafên mirovahiyê yên neteweyî hene hem jî di temamî olan de ev yek rewa ye, bi taybet jî di ola Îslamê di Qurana Pîroz de ev yek bi ayetên pîroz tê tespîtkirin. Ma qey ne bes e ku ev xwîna li Tirkiyeyê diherike nayê seknandin. Ma qey ji asîmanan kesên werin vê pirsgirêkê bidin seknandin hene? Bila, baş bê fêmkirin ku her kes li Tirkiyeyê ha tirk ha kurd li gorî mewqî, meqam û peywirdariya xwe berpirsyar e ango mesûl e, mesûl e, mesûl e.

Ez wek kurdekî, nivîskar û dilxwazê gelê kurd û gelê tirk neçar mam ku van hest û ramanên xwe û hisên xwe yên însanî ji çapemeniyê re rêkim.

Roşn

**Mamosta Silêman**

*mamoste.suleyman@hotmail.com*



## Sîyaseto demokratîk û operasyon

Hêzanî asayişê, nê rojanî peynîyan de, mûqabîlî (qarşîyê) DTP, yew operasyono hîra (hera) dest pêkerdo, bi seyan berpirsîyarî, endamî û aktîwîstî DTP, girîyayî binî çiman û nînan ra reyna bi seyan merdimî debîyî hepisxaneyan. Semedê nê operasyonê zaf munaqeşeyî benî. Rasta ey, no operasyon hewayê yew darbeyê, yeno hesibnayene (hesibnayiş). Ewta de, armanc; şiktişê îradeyê DTP yo. Reyna ewta de bellî yo ke, Dewlete û AKP, tehamulê netîceya no vîjnayişê peyine nêkerdo. Rasta (reşta) ey ma waştnî ke Hûkmatê AKP û Dewleta Tirkîya, mesajî nê vêçînayiş û Newroza 2009ê fam bikerdinî û goreyê nê mesajan têbigeyraynî. Feqet seke vanî; "Bi nê operasyonan yew cûwalê încîlan berbat kerdo." Şarê kurdan inahewa yew operasyon nêpawitnî. Nê oprasyonî meselaya kurdan, esla hal nêkenî.

Vîjnayişê serekanî belediyayan de DTP, 98 serekeyî belediyayan qezenc kerdî. Eke yew zemîno demokratîk de, no vîjnayîş bibîynî, na hûmare hîna vêşî bîynî. Serekwezîr Tayîb Erdogan vano ke;" DTP; sîyasetê etnîsîteyê kena, ancax mitiqaya kurdan de rayan gêna." Erdogan û partîya ey, mûqabîlî DTPê, çi dest ra yeno kenî. Erdogan yew het ra heyetê parlementeranî DTP qebul nêkeno. Yewna het ra vano; "Ez destê parlementeranî DTPê nêtewşena." Mûqabîlî (qarşîyî) DTP, nizdîbîyayişê û têgeyrê Serekerkanî Pîroyîyey zî eynî yo. Parlementerî DTP, îradeyê şarê kurdan temsil kenî. Têgeyr û zîhnîyetê nê berpirsîyaran, şarê kurdan weş nîyno û înan eciz keno. Pekî no têgeyr û zîhnîyet kura ra yeno? Goreyê ma, no têgeyr û zîhnîyet, polîtîkaya red û înkarê ra yeno. Na zî zelal a ke, Birêz Erdogan zî zaf tesîrê na polîtîkaya asîmlasyonî de mendo. Serekwezîr bo zî qet adîl niyo. Yew het ra berpirsîyaran, endaman û aktîwîstanî DTPê tewşenî. Yew het ra destan, lingan û fekê DTP yan bestenî. Şima heme çeşit (bêj) zilm, tada û lîncan teşwîq kenî. Dima zî şima vanî; "DTP, polîtîkaya etnîsîteyê kena. Nişna (nêşkena) rojawanê Tirkîya de organîze bibo.Şima serdestanî Tirkîya; hima zî kurdan, vatiş de (sözde) hemwelatî hesibnenî. Şima TRT 6 bakî û tayê qanûnanî xo bibedilnî zî şima nasnameyî kurdan hima zî qebul nêkerdo. Organîzebîyayişê Tirkîya de, kurdî çinbîyaye hesibîyenî. Tirkîya de, heme meseleyî no zîhnîyet ra yenî meydan. Çi heyf ke, berpirsîyarî Tirkîya bi na polîtîkaya asîmîlasyonî pîl benî. Beynê înan adeta fecir bîyo. Nê berpirsîyaran hima zî polîtîkaya DTP ra çîy fam nêkerdo. Rasta ey DTP, Tirkîya û demokrasîyê Tirkîya rê yew şans a. DTP Tirkîya de di çîyan wazena . Nînan ra ay yewin; DTP wazena ke, hem şarê kurdan û hem zî şarî bînî, bi heqanî xo yê neteweyî, bi azadî îfade bikî (bikerî). Ay dîyin zî wazena ke, Tirkîya de heme kes, wa bi bîr û bawerîya xo, xo îfade bikero. Yanî DTP wazena ke hem hetê manewîyatê de, hem zî hetê maddîyatê de heq edelet û yewîyey bibo. Reyna DTP wazena ke meseleya kurdan bi aştî demokrasî hal bibo. Aseno ke polîtîkaya DTP, polîtîkaya partîyanî bînan ra zaf cîya ya. DTP wazena ke, cêr ra hetan cor heme kes, rêxistinanî sivîlan (partîyan, komelan û sendîqayan) de organîze bibo û sîyaset de wayîrî yew îradeyê demokratîkê bibo Hem heqanî xo ê manewî û hem zî ê maddî bi îradeyê xo yê demokratîkê bipawo. Înahewa yew zemîno demokratîk de yew karsaz û yew bêkar wayîrî eynê heqan î. Yanî DTP temsîlîyet de zî edalet wazena. Yanî merkezê sîyasetê DTP de merdim û merdimanî esta. Ma ewta de, rehet eşkenî vajî; DTP; temamen çerçeweyê qanûnê Tirkîya de, yew sîyaseto demokratîk ramena.. Şima heme bînanî DTP bigeyrî, şima nişnî (nêeşkenî) yew şifilê kardî veynî. Yanî DTP, sîyasetê xo de, aştî û demokrasî esas gêna. Xora nê merdimî ke ameyî tewiştene, înan ser o yew şifilê kardî zî nêtewşîyayo. Aseno ke nê merdiman waşto ke saseta demokratîk bikî (bikerî).

Ma wazenî ke nika ra pey Tirkîya de yew plan û programê aştî organîze bibo. Kurdan û şaranî Tirkîya, na polîtîkaya red û înkar û şîddetê ra zaf ezêt (ezîyet) anto. Bi hepisxaneyan û oprasyonan esla meseleyî hal nêbenî. Lazim o ke Tirkîya de, yew ripelo newe û pank biabo. Çare demokrasî yo, dîyalog o û aştî ya.

# Li Dêra Kirimê helbestên kurdî



Fatma Savci

Di çarçoveya Festîvala Helbestan a Navneteweyî ya Beyogluya Stenbolê 'Şîîr Stenbol' de helbestên kurdî deng veda. Helbestvan Fatma Savci bi 'Qedera Qurnefîlê' û Gulîzer jî bi 'Porkurê' amade bûn

4'emîn Festîvala Helbestan a Navneteweyî ya Beyogluya Stenbolê "Şîîr Stenbol" ji aliyê Komeleya Enstîtuya Zanistiya Civak û Dîrokê û Şaredariya Beyogluyê ve tê organîzekirin.

Festîvala ku PEN'a Tirkiyeyê û Komeleya Wêjevanan jî piştgirî didê de îsal ji 31 welatan 42 helbestkar beşdar dibin. Dêra Kirimê di sala 1858'an de di dema şerê Kirimê de dest bi çêkirina wê hatiye kirin. Mîmarê wê G.E. Street e û erseya dêrê ji aliyê Siltan Abdulmecid ve hatiye pêşkêşkirin. Çêkirina dêrê 10 salan didome û heta sala 1971'ê ew der ji bo îbadetê tê girtin. Piştî ku hejmara cemaeta dêrê kêm dibe wê salê dêr tê girtin, di sala 1991'ê de careke din tê vekirin. Di van çend salên dawî de jî dêr digel îbadetê xizmetê çalakiyên çandî jî dike.

Digel helbestkarên Îngilistan, Kuba, Îran, Iraq, Sûriye, Lubnan û Tirkiyeyê helbestkarên Kurdistanê jî tevli festîvalê dibin. Festîval ji her zimanî helbestkaran beşdar dike. Helbestkar bi zimanên xwe tên cem hev û xwe didin nasîn. Her wiha çalakiya mîhrîcanê roja di 22'yê nîsanê de li Dêra Kirimê hate lidarxistin. Di şahiyê 'Helbestkarên jin digihêjin hev' de Şarareh Karmanî (Îran), Marîa Elena Balanco (Kuba), Fevziye El Mîr (Sûrî), Paula Meehan (Îrlanda), Olcay Oztunali (Tirkiye), Oya Uysal (Tirkiye) û gelekên din helbestkarên kurd Fatma Savci û Gulîzer jî amade bûn. Helbestkarên jin her yek ji wan bi zimanê xwe helbest xwendin, Fatma Savci û Gulîzerê jî bi zimanê xwe.

Savci beriya ku dest bi helbesta xwe bike diyar kir ku jinên DTP'î ku tekane sûcê wan ew bû têkoşîna siyasî didan, demek berê di operasyona li hemberî wan de hatin binçavkirin û girtin. Savci anî ziman ku vê operasyonê şermezar dike û helbesta xwe diyarî wan dike. Savci piştî axaftina xwe dest bi helbesta xwe "Qedera Qurnefîlê" kir. Helbestkara kurd Gulîzer jî helbesta xwe ya bi navê "Porkurê" xwend.

Di 24'ê mehê de saet 12.00'an de li Şanoya Muammer Karacayê dê bi navê "Kurd, jin û helbestkar" şahiyek di bin rêveberiya helbestkar Jana Seyda de bê lidarxistin. Di çalakiyê de helbestkarên kurd Gulîzer, Fatma Savci û Xelat Ahmed wê hem helbestên xwe bixwînin hem jî qala çîroka helbestên xwe bikin.

Her wiha di heman rojê de saet 18.30'yan de jî li Navenda Hunera Kumbarayê di bin rêveberiya Xwediyê Weşanên Avestayê Abdullah Keskîn de dê çalakiya "Wêjeya Kurd a Modern" li dar bikeve. Di çalakiyê de nivîskar Abidin Parilti wê li ser wêjeya kurdî biaxive. Ligel vê yekê şahiya ku herî zêde balê dikişîne 'Kevneşopiya çîrokbêjî û dengbêjiyê ye'. Ev şahî jî dê di 26'ê mehê de li Navenda Hunera Kumbarayê bê lidarxistin. Ev şahî dê ji aliyê Abîdîn Parilti bê pêşkêşkirin. Dengbêj Seydxanê Boyaxçî wê hem kilamên xwe bibêje û hem jî qala çîroka wan bike. Mîhrîcana Helbestan a Stenbolê dê heta 29'ê nîsanê dê çalakiyên cur bi cur bidome.

CEMÎL OĞUZ
STENBOL/ANF



Gulîzer

## Xelatên Pulîtzer hatin dayîn

Kesên hêjayî xelata Pulîtzer a 2009'an hatin aşkerakirin. Li Zanîngeha New York Columbîa xelatên Pulîtzer yên beşa 'Rojnamegerî, Drama, Wêje û Muzîkê' li dibistana Rojnamegeriya zanîngehê bi daxuyaniyeke çapemeniyê aşkera kirin. Kêsên ku hêjayî xelatan hatibûn dîtin ji aliyê nûnerê xelatên Pulîtzer, Sig Gîssler ve hat diyarkirin.

Rojnameya DYA'yê New York Tîmes di pênc warê rojnamgeriye de xelat wergirt. Sala borî jî Rojnameya Washîngton Post di şeş warê rojnameriyê de xelat wergirtibû lê îsal tenê xelatek wergirt. Di wêjeyê de jî di warê 'pevbestîn'ê de nivîskar Elîzabeth Strout bi pirtûka xwe ya 'Olîve Kîtterîdge' xelata Pulîtzer wergirt.

Her wiha di warê 'drama' de jî nivîskar Lynn Nottage Kongo bi lîstika xwe ya 'Ruîned' hêjayî xelatê hate dîtin. Nivîskarê amerîkî Annette Gordon- Reed bi pirtûka xwe ya 'The Hemîngses of Montîcello- An Amerîcan Famîly' xelat wergirt. Di warê 'Biyografî'yê de jî Jon Meacham bi pirtûka xwe ya 'Amerîcan Lîon: Andrew Jackson în the Whîte' xelat wergirt. Di warê helbestê de jî W.S Merwîn bi helbesta xwe ya 'The Shadow of Sîrîus' xelata Pulîtzer wergirt. NEW YORK

## Li Stenbolê 'Mirina Zimanekî'

Teatra Avesta lîstika xwe ya bi navê "Mirina Zimanekî" vê carê li Şanoya Muammer Karaca pêşkêşî hezkiriyên şanoyê kir.

Lîstika bi navê "Mirina Zimanekî" ji lîstika xwediyê Xelata Nobelê Harold Pînter "Zimanê Çiya" ku ji aliyê Mehmed Uzun ve bo kurdî hatibû wergerandin û ji helbesta Mehmet Uzun "Mirina Egîdekî" hatiye girtin. Her wiha di lîstikê de muzîka Ciwan Haco jî hatiye bikaranîn.

Lîstik li Muammer Karacaya Beyogluya Stenbolê hate lîstin. Temaşevanan eleqeyeke mezin nîşanî lîstikê da.

Derhêneriya lîstikê Aydin Orak kiriye û di lîstikê de Bilal Bulut, Şengul Ozdemir, Perihan Adalmiş û Aydin Orak dilîzin. Ronahiya lîstikê Ahmet Çay, kostum Sezgîn Aydin, asîstaniya derhêner Saît Kulen û makyaja plastîk jî aîdî Soner Caner e. STENBOL



Lîstika bi navê 'Mirina zimanekî' ku ji aliyê lîstikvanên Teatra Avesta ve tê lîstin li Şanoya Muammer Karaca hate pêşkirin. Temaşevanan bi eleqeyeke mezin lîstik temaşe kirin.

## Li Generalên Biçûk ên Apê Mûsa ceza birîn

Doza ku der barê pirtûka bi navê 'Generalên Biçûk ên Apê Mûsa' ku ji weşanên berçem derketî bi encam bû. Bi îdiya ku nivîskarê pirtûkê Îrfan Karaca 'Propagandaya rêxistinê kiriye salek û 3 meh cezayê girtîgehê li birîn. Pirtûka 'Generalên Biçûk ên Apê Mûsa' sala borî di meha adarê de derket. Di îdianameyê de wiha tê gotin; "Di pirtûkê de pesnê faeliyetên endamên kadroya çiya ya rêxistina PKK, KONGRA-GEL tê dayîn. Têkoşîna mîlîtanên rêxistinê mafdar dibînin û propagandaya rêxistinê dikin."

Her wiha di îdianameyê de navê PKK, KONGRA-GEL biçûk hatibû nivîsîn û ev yek tîne bîra mirov ku rêbazên Saziya Ziman a Tirk li çavan negirtine. Der barê mijarê de parêzerê Îrfan Karaca, Ozcan Kiliç diyar kir ku ev biryar ne li gorî AÎHM'ê ye û her wiha got ku ev biryareke balkêş e. Kiliç anî ziman ku di pirtûk hêmayên şîdetê tuneye.

Ligel vê yekê nivîskarê pirtûkê Îrfan Karaca anî ziman ku dê vê cezayê temyîz bikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Bi îdiya ku pirtûkê propagandaya rêxistinê kiriye ceza lê birîn. Ev biryarek ne heq e. Di pirtûkê de şert û mercên ku belavkarên rojnameya Ozgur Gundemê tê de dixebitin vedibêje.

Di salên 90'î de bûyerên ku hatin jiyîn tê vegotin. Çawa ji bo pirtûkên dibêjin propagandaya rêxistinê ez matmayî dimînim.

Bi vê biryarê em niha baş fêm dikin ku azadiya xwe îfadekirinê hê jî di bin gefê de ye. Fikr û raman hê jî sûc e. Ez hêvîdarim ku dê ev biryar ya dawî be. STENBOL


## Bîranîn



Abdulrezzak Begik
23.04.1994 Sason

Şiyar bûn ji xewê
Keç û xortên
qehreman
Hildidin tol a
hezar salan
Azad dikin dayika
me Kurdistan

Li ser navê
malbata wî dayika wî
Meryem Begîk


www.arsivakurdi.org



**Yildiz GULTEKÎN**

yildizgultekin@hotmail.com

# Tansyona bavê min

Dema ez ezep bûm, yanê wextê zewaca min hat, bavê min ez girtim dame yekî xerîb, xerîb dibêm lê min piştre nas kir, hema çend caran jî dilê min bi ser wî de keliya, çend caran di wê kuça hinda mala me ra derbas bû. Hema ez direvîm li ber deriyê malê min melûl melûl li wî mêze dikir. Ew jî vala ne disekinî, hema qet karê wî li wan deran hebûya jî, tunebûya jî biroj heta êvarê çend caran li kuça me dihat û diçû.

Neyse zêde dirêj nakim, wan rojên hanê bavê min hate mala min, min dixwest cendekî li ba min bimîne, ew hinekî jî kal bûye, guhê wî kêm dibihîsin, emrê wî hinekî zêde bûye, lê dîsa jî li ser xwe ye. Min gelekî bêriya wî kirîbû, dema ew hate cem min esqana aqilê min li serê min firî.

Çend rojan me herduyan behsa zemanê berê kir, em carana keniyan, carana jî giriyan. rojekê çend heb keçikê azep li cînarê min in, wana got em dixwazin bavê te rojekê bibe mêvanê me, min got hay hay, ser çavê min.

Min qala keçikê cînarê xwe kir, min got bavo ev keçikê cînarê min pirê wan xebatkar in, yên din jî dixwînin, ew dixwazin îro tu bibî mêvanê wan. Em rabûn çûn, dayêêê, ezet,hirmet, cuda cuda xwarin çêkirine, xwe xemilandine, der û dora bavê min vize viz dikin, diçin û tên, yek destê bavê min digre, yek pişta wî miz dide, ya din xwarinê didê, ya din ji eşqê xeber dide, hema bavê min xwar bû li ber guhê min got: keçê evana horîne, çine! lê te qet ne digot ew cînarê min ewqas pak û rind in!

pey maşalla maşalla, hema ew bû kêfa me hatibû, ji nişkê ve bû pişkîniya xwînê ji bêvila bavê min hat,

Dayê rebenê çend seata ew xwîn nesekinî, me dî nabe, em bi lez çûne nexwasxanê, textor wiha li bavê min û ew keçikê li der û dora wî mêze kir, got: Xalooo ev heyecan ji te re rind nîne, binêr waye tansiyona te firiyaye li ezmana dikeve, heke tu piçikekî dereng bihatayî wê halê te qet nebaş bibiya. Bavê min vegeriya ji textor re got, qet behsa van keçika neke, ewana li cem kê bisekinin wê hema di cî de bimirin, qet xelasbûna wan tuneye. em keniyan, min ji keçika re got zû herin wan cilên xwe biguhirin, waye bavê min baş xuya nake. wana bi gotina min kir lê heta sê-çar rojan bavê min nexwaş bû, hema dikire nale nal, digot kanê hema hatina cînarê te carek tenê bû!

Ez rûniştim min got bavo qurban, hatina keçikan ji bo tansiyona te qet baş nîne, ew niha karê wan hene,ew dixebitin,dibetilin, tu bi gotina min bike, li siheta xwe binêre. Çend rojan wî kire nale nal, dema min ew rêkir careke din got te dît ew keçikê cînarê te nehatin ez rê nekirim! min qet tiştek negot, dema bavê min li erebê siwar bû, dît ku ew keçik hemû sekinîne destê xwe ji bavê min re li ba dikin. ew keniya û kêfxweş bû... lê heta çendekê ez tirsiyam gelo halê bavê min çawa bû? paşê tu mesele neman, bavê min niha dîsa li cem min e.

## XÊZIK NAME

Bêtehemûliya têkçûnê




Dema hesabxwestinê ye




Terora li dijî zarokên kurdan






**Rizoyê XERZÎ**

rizoxerzi@gmail.com

# Ev qedera me koviyan e

Salvegera 111'emîn hezar û sed û yazdeh caran li hemû rojnamevan û xebatkarên çapemeniya kurdî pîroz be. Mixabin di vê bîranîna 111'an de jî hişmendiya zordaran nehate guhertin û di van rojan de mehek cezayê girtinê li Rojnameya Azadiya Welat a yekane û bi tenê ya ku bi kurdî li Tirkiyeyê derdikeve hate birîn.

Bi her halî rewş wiha diçe û bi ser de jî ev girtina çend berpirsiyar û rêveberên saziyên kurdan hat. Bêguman her kurdê ku rojev û tevgera kurdên bakur dişopîne ew baş sedemên van girtinan dizane û fam dike. Ji xwe ji berê ve gotine dijminayî bê minetî ye. Ji ber ku pêwîst e nivîsa min qerfî be lewre ez ê nêzî aliyên siyasî yên vê mijarê nebim.

Piştî van binçavkirin û girtinên ku di 14'ê nîsanê de dest pê kirin li gelek bajaran mirovên welatparêz hatin girtin, êdî gelek kesên ku haya kesekî ji wan nîn e jî xwe dûrî karê xwe dikin û wek mesela xezalê û kûsî li serê wan hatiye. Ez ê pêşî ji we re bi kurtî behsa çîroka xezalê û kûsî bikim da ku tiştê ez dixwazim behs bikim bêtir were famkirin.

Çîrok wiha ye: Xezalek birîndar dibe û bi wê birîndariya xwe baz dide û xwe di çalekê de vedişêre, di wê navê de kûsiyek jî xwe bi hilkehilk nêzî xezalê dike û xwe vedişêre. Kûsî ji xezalê dipirse te xêr e xwişka Xezal çima wiha bêhnçikyayî xwe vedişêrî? Xezal bersivê dide û dibêje, nêçîrvanan ez birîndar kirime û ez xwe ji wan vedişêrim. Kûsî lê vedigerîne û dibêje erê erê xwişka Xezal ev qedera me koviyan e. Li ser vê gotina Kûsî, Xezal pir hêrs dibe û dibêje tu zanî heke ez ji ber birîna xwe nemirim jî ez ê ji ber vê tana te bimirim ku tu min û xwe dikî yek.

Îca heyrana çavên we, hewce nake hûn ewqasî xwe veşêrin ji ber ku kesek li we nagere û heke ji bo wan tawambariyên ku ji ber wan ew mirov hatine girtin sûc be, bi her sê navên xwedê kesek ji me tune ye ku ew sûc nekirine. Çi kesê ku xwe wekî kurd dibîne her roj van sûcan dike êdî ji bo pûçkirina van girtinan pêwîst e ku kurd tev wekî ku hevseroka DTP'ê Emîne Ayna jî got, bêjin em tev sûcdar in û em ixbara xwe dikin. Ya ji van tevan xirabtir êvara 23'ê nîsanê, cejna zarokan para zarokên kurdan ji xelatan nehate jibîrkirin û Dadgeha Cezayê Giran a Diyarbekirê ji bo 4 zarokên 'terorîst' ên kurdan ku kevir avêtine panzerên bê guneh ên dewletê her yek ji wan zêdeyî 6 salan cezayê zindanê ji wan re hate xwestin. Kî dibêje haya dewletê ji kurdan tune ye û gavên berbiçav ên demokratîk navêje, ma ji vê diyariyê xweştir heye ji bo zarokên kurdan û bi taybetî jî ku ev ceza di êvara cejna 23'ê nîsanê de hate diyarîkirin. Ewqas bes e heyra, em hinekî din jî zêde bikin wê wek kûsî li me were, hemû demên we bimînin xweş û ji bîr nekin, ez li hêviya rexne û pêşniyarên we me.

## Rojeva Eyşo

rusen.sarili@gmail.com

Remo û Eyşo bûn xwazgînî




Aqilê Remo bûkê nebirî




www.arsivakurd.org

ROJEV
24 Nîsan 2009 Hejmar:9 Sal: 1

ROJEV
Zin Basın Yayın
İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu
Yazı İşleri Müdürü
Cesur YILMAZ
Adres:
Şehit Muhtar Mahallesi
Yoğurtçu Faik Sokak No:12/2
Beyoğlu - İstanbul
TEL: 0 (212) 253 93 34
Fax: 0 (212) 244 06 52
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık,
Reklam, Film, Basım, Yayın,
Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Sefaköy - Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 80
Edene: Arslan Güneydoğu
Gazetecilik,
Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstiklal mah. İstiklal. Cad.
No: 44 Seyhan
Edene
Yayın Türü: Süreli

Her sal 23'yê Nîsanê bernameyên pîrozbahiyê tên amadekirin. Lê zarokên kurdan îsal jî ji wan pîrozbahiyan bêpar man û weke her carê di 'cejn'ê de xebitîn

# Cejn ji bo wan tiştekî îfade nake!

Zarokên kurd ên ku ji ber sedemên cur bi cur koç kirine û hatine Edeneyê, 23'yê Nîsanê di stadyûmên ku pîrozbahî lê tên kirin de sîmîtan difiroşin û Cejna Zarokan wiha pêşwazî dikin.

23'yê Nîsanê ango Cejna Zarokan li hemû deverên Tirkiyeyê bi şahiyên cur bi cur tê pîrozkirin. Lê zarokên malbatên kurd ên ku ji ber zilm û zora dewletê koç kirine û hatine Edeneyê di 23'yê Nîsanê de jî li kolanan dixebitin. Zarokên kurd çopan ji hev derdixin, sîmîtan difiroşin û bi vî rengî alîkariyê didin malabatên xwe. Zarokên kurd di 23'yê Nîsanê de jî li derûdora stadyûmên ku pîrozbahî lê tên kirin sîmîtan firotin.

**Zaroktiya xwe najîn**

Zarokê bi navê Ahmet Uçat (16) ji nava çopan kartonan derdixe, şîşe û caman ji hev derdixe û bi vî rengî alîkariyê dide malbata xwe. Ahmet Uçat wiha axivî: "Ji ber ku cerdevanan gundê me şewitand, me ji Mêrdînê koçî Edeneyê kir. Ji ber ku rewşa aborî ya malabata min ne baş e, ez jî dixebitim û di nava çopan de tiştan berhev dikim. Dema ku dibêjin 23'yê Nîsanê kêfxweşî û bextewariya zarokan tê bîra min. Lê ez nikarim zaroktiya xwe bijîm, nikarim bigerim. Ji bo ku pere bibim malê mecbûr im ku bixebitim. Ji ber ku rewşa aborî ya malbata min ne baş bû min dev ji dibistanê berda û piştî pola 7'emîn neçûm dibistanê."






**Weke her carê dixebitin**

Zarokê bi navê Omer Baral (16) jî bi firotina sîmîtan alîkariyê dide malbata xwe. Omer Baral jî der barê 23'yê Nîsanê de wiha axivî: "Ev 8 sal in ez sîmîtan difiroşim. Serê sibehê zû radibim û diçim firinê. Ji vir sîmîtan digirim. Piştî ku sîmîtan difiroşim bi pereyê ku dikeve destê min pêdiviyên malê bi cih tînim. Rewşa me ya aborî ne baş e. Em nikarin pereyê ceryan û avê bidin. Şert û mercên jiyanê dijwar in, ji ber vê yekê jî ez jî dixwazim alîkariyê bidim malbata xwe. Em zivistanê ji serê sibehê heta êvarê li ber sermayê, havînê jî li ber germê dimînin û sîmîtan difiroşin. Dema ku tê gotin 23'ê Nîsanê çûyîna stadyûmê û li vir firotina sîmîtan tê bîra min."

Malbata zarokê bi navê Veysî Aşma jî ji Mêrdînê koçî Edeneyê kiriye. Aşma jî hestên xwe wiha vegotin: "Ji ber ku rewşa me ya aborî ne baş bû piştî dibistana seretayî min dev ji dibistanê berda û dest bi firotina sîmîtan kir. Heke rewşa me ya aborî baş ba min ê çima sîmît bifirotana. Heke pereyê me heba ez ê jî bigeriyama. Zarokên din dikarin bigerin. Lê derfeteke me ya bi vî rengî tune ye."

Şiyar Aydemîr û Ugur Demîr jî bi firotina sîmîtan alîkariyê didin malbatên xwe. Ew jî naçin dibistanê û dibêjin ku ew mecbûr in bixebitin. Ew jî weke hemû zarokên ku li kolanan dixebitin dibêjin ku 23'yê Nîsanê ji bo wan tu tiştî îfade nake. Her wiha îsal jî di 23'yê Nîsanê de ji bo ku alîkariya malbatên xwe bikin xebitîn. Cejneke din jî bi vî rengî derbas kirin.



## Gola herî romantîk!

Li Norwecê goleke pir balkêş heye. Bi her awayî xwezayî ye. Şeklê golê weke dil e. Ev gola ku dişibe dilê mirov hezar kîlometre dûrî Cemsera Bakur e. Her wiha weke gola herî balkêş a cîhanê tê qebûlkirin. Li gorî texmînên zanyaran ev gol piştî guherîna avhewayê di dema cemedan de bi awayekî xwazeyî çêbûye. Dema ku cemed şikestine ciheke kûrbûna wê 2,7 metre û dirêjahiya wê 3,5 metre derketiye holê. Ev valahî di şeklê dil de ye. Piştî ku baran bariye û ev der tijî av bûye jî dîmeneke pir xweşik û balkêş derketiye holê. Kesên ku tên vê derê ji ber xweşikbûna xwezayê û golê sermest dibin. **OSLO**




## Salê 3 ton bacanan dide

Çîniyan di fuara zanist û teknîka sebzeyan de dareke ku salê 3 ton bacanên sor (firingî) dide pêşkêş kir. Fuara zanist û teknîka sebzeyan li bajarê Shouguangê pêk tê. Di fuarê de li derdora 2 hezar cure sebze, fêkî û kulîlk tên pêşandan. Çîniyan cara ewil di vê fûarê de dareke balîcanên sor jî pêşkêş kir. Hate ragihandin ku ev dar salê 3 hezar kîlo bacan dide. Dara ku salê 3 hezar kîlo bacan dide di fuarê de eleqeyeke mezin dît. **PEKÎN** *(netkurd)*




## Li Qersê berf barî

Li Qersê ligel barîna berfê bahozê dest pê kir. Li bajarê Serhedê Qersê di demeke welatî êdî li benda hatina biharê û zêdebûna germê ne, berfê cardin xwe nîşan da. Li bajar ligel barîna berfê bahozê jî dest pê kir. Di encama barîna berf û rabûna bahozê de welatiyan tengasî kişandin. **QERS**



## Astront ji bo çûna rojgera Marsê amedekariyan dikin


Mars yek ji rojgerên ku bala mirovan dikşîne û heviya jiyanê lê tê kirin e. Ji ber vê yekê çavê mirovan her li çûn û keşifkirina wê ye. Niha merhela yekem a rêwîtiya Marsê bi awayekî fermî dest pê kir.

Bernameya sîmulasyonê ya ku yek ji hedefên rêwîtiya bi mirov ya Marsê ye dest pê kir. Bername ji aliyê Ewropa û û Rûsyayê ve tê birêvebirin. Ji bo amadekariyên bernamê, 4 rûs, 1 fransiz û 1 alman tên perwerdekirin. Van astronotan di nava kapsuleke girtî de dest bi jiyaneke taybet ya perwerdê kiriye.

Tîma ku ji 6 astoronatan pêk tê hefta borî li nêzî Moskowê di baxçeyê Enstîtuta Lêkolînên Medîkal û Biyolojîk (IMBP) de ketin nava kapsula metal. Ev tîm dê 105 roj bê ku ji kapsulê derkeve, fêrî jiyana rêwîngiyê bibe. Wê jiyana astronotan 24 saetan bi kamerayan bê şopandin.

Tîma ku tevlî ezmûna rêwîngiya Marsê bûye hemû zilam û ji rûs, fansiz û almanan pêk tê. Astronotê rûs Sergey Rjasanskî wek serokê komê hatiye hilbijartin. Ew dibêje jiyana di mekaneke teng de dê di navbera endamên komê de tengasiyan dernexe. Rjasanskiyê 34 salî pisporê biyokîmyayê ye. Ew dibêje ger pêwîst bike dê ji bo stresa xwe bavêjin, bi hev re xebatên muzîkê bikin.

Astronotên nîgaşî heta ji wan tê dê di nav kapsula xwe de şertên rêwîtiya Marsê bijîn. Wê li dijî xeterên ku tên serê rêwiyên fezayê yên wek helandina hestî û masûlkeyan, egzersizan bikin û her daîm bi "îstasyona erdê" re di têkiliyê de bin. Wê têkiliya wan li gorî rewşa dûrbûna Marsê ya ji dinyayê 20 deqe dereng pêk were. Her wiha wê bandora dûredirêj ya kêşana erdê jî bê testkirin.



Li gorî texmînan herî zû rêwîtiya Marsê dê di sala 2030'î de bê pêkanîn. Ji rayedarên Enstîtuta Lêkolînên Medîkal û Biyolojîk Yevgenî Dyomîn dibejê dê endamên tîmê di nav kapsulê de gelek ezmûnên tibî jî pêk bînin. Wek mînak wê diranê yekî tijî bikin û her wiha îhtîmala mirina yekî bidin berçavan û li gor wê yekê tevbigerin. Wê tevgera endamên tîmê ji aliyê pisporan ve bê şopandin.

Ceribandina rêwîtiya Marsê ji aliyê Ajansa Alman ya Hewayî û Fezayê û Ajansa Ewropayê ya Fezayê tê piştgirîkirin. Maliyeta ezmûnê nêzî 15 milyon dolar e.

**Ji rêwîngiya hêyvê zehmettir e**

Zanyar dibêjin ku rêwîtiya Marsê wê ji ya hêyvê cudatir be. Tevî vegera rûyê erdê wê rêwîtî bi giştî du salan bajo. Wê astronot di vê demê de dinyayê nebînin. Berî vê keştiyeke fezayî li Marsê danîbû û ji wir gelek wêne û agahiyên din şandibûn. **BONN** *(rudaw)*

www.arsivakurdi.org